## ÎHD ji bo Tamçoban rûnişt

ÎHD'a Amedê bi armanca şermezarkirina qetilkirina Mehmet Nuri Tamçoban ku li gundê Xecîxatûna navçeya Ebexê ya Wanê ve, şermezar kir. ÎHD'ê bi boneya kuştina Tamçoban a ji aliyê leşkeran ve li ser sînorê Îranê pêk hat, çalakiya rûniştinê ya ji bo saeteke li dar xist. Rêveberên ÎHD'ê û bi dehan kes tevlî çalakiyê bûn. *RÛPEL – 3*



## Hinceta Atalay a sosret!

Wezîrê Karê Hundir Beşîr Atalay, angaşt ku cezayê endamê PKK'ê Ahmet Şerîf Karakaya'yê ku di 15'ê gulana 2009'an de di operasyona ku li Sêrtê pêk hatibû de jiyana xwe ji dest dabû, ji ber cihê helîkopter lê deyne tunebû nehatiye hilgirtin. Wezîr Atalay, parast ku ji ber tu sûcê personel tunebûye lêpirsîn jî venekirine. *RÛPEL - 4*

## DADGEH LI GEL KU 'FÊM NEKIR' LI SER DOWÎZÊ ÇI NIVÎSANDIYE MAMOSTE JI KAR AVÊT

# Dest ji ehmeqiyê bernadin



5'emîn Dadgeha Cezaya Giran a Amedê ji Mamosteyê Matematîkê Sedat Ertaş, ku li Dibistana Suleyman Demîrel a Qoserê mamostetî dikir, bi îdiaya "Dowîza naveroka wê ne diyar" hilgirtiye salek cezayê girtîgehê da. Ertaş, piştî biryara cezaya wî hate erêkirin, di nava dersê de ji aliyê polîsan ve hate binçavkirin û piştre jî hate girtin. Ertaş dema ku li Fakulteya Perwerdehiyê ya Zanîngeha Sêrtê dixwend, bi sedama tevlî daxwayaniya piştî gireva birçîbûnê ya ji bo şermezarkirina mercên Ocalan a ji aliyê Komela Malbatên Girtiyan a Sêrtê ve hatibû lidarxistin dowîz vekiribû doz hatibû vekirin. *RÛPEL – 3*



## Durûtiya Ewropayê şermezar kirin

Bi hezaran kurdistaniyên li welatên cur bi cur ên Ewropayê dijîn li paytexta Bruksela Yekitiya Ewropayê li hev civiyan û zordestiya li welatên Ewropayê ku li hemberî siyasetmedarên kurd tê meşandin protesto kirin. Kurdistanî li pey pankanta 'Nebin şirîkên komkujiya siyasî û çandî ya li hemberî kurdan' meşiyan. Di meşê de alên ERNK'ê hatin vekirin. Siyasetmedarên kurd Remzî Kartal û Zubeyîr Aydar jî beşdarî meşê bûn… *RÛPEL - 4*


# ROJEV

4 Nîsan - Yekşem 2010 | E-mail: awelat2002@yahoo.com Buhar 50 kr. Hejmar: 6


## 4'ê Nîsanê pîroz kirin

Koordînasyona Tevgera Jinan KJB'ê, rojbûna Ocalan a 61'emîn bi daxuyaniyeke nivîskî pîroz kir. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Roja rojbûna me 4'ê Nîsanê ku weke rojeke ji dîroka me, ya ku ji aliyê serdestan ve hatibû tunekirin, derketiye û bi taybetî jî em jin xistiye nava lêgerîna rastiya xwe."... RÛPEL - 7




# Gel berê xwe da Amarayê

Ji hemû bajarên Kurdistanê bi mebesta 4'ê Nîsanê rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pîroz bikin bi deh hezaran kesan berê xwe dan Amarayê. Kurdistaniyên herikîn Elîgora Xelfetiyê qamp danîn

## Tecrîda Îmraliyê vegotin



Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan têkildarî dozên şert û mercên ev 11 sal in li Îmarliyê didomin, li DMME'yê hatin vekirin, parastin kirin. Parêzeran diyar kir ku hikumetê parêznameyên Ocalan ên ji bo DMME'yê rê kiriye astengkirine û bi vê yekê re hiqûq îhlal bûye. Parêzeran, da zanîn ku li gorî xala 34'an a peymanê serlêdana DMME'yê mafekî heq e û bi tu awayî nayê astengkirin. Her wiha disa di parastinan de hate ziman ku Ocalan ev 11 salin dibin tecrîtê daye û rastî pêkutiyên cuda tê. Her wiha parêzeran, da zanîn ku raporên ji aliyê CPT'yê ve hatine girtin, ji aliyê hikûmetê ve nayên dîtin… *RÛPEL - 5*



### LI QADA 4'Ê NÎSANÊ QAMP DANÎN

Girseya kom bi kom bi mebesta rojbûna Ocalan pîroz bikin, li Elîgorê civiyan. Komên ji Pirsûsê ketibûn rê, gihiştin bajaroka Elîgor. Bi deh hezaran kesên ku ji gelek bajar û navçeyan li "Qada 4'ê Nîsanê" gihiştin hev govend gêrandin. Kurdistaniyên li vir civiyan 4'ê Nîsanê guherand mîhrîcanê

### 'MEŞA BER BI ROJÊ VE'

Hin komên ji bo tevlibûna 'Meşa Ber Bi Rojê Ve' ku ji bo rojbûna Ocalan a ji aliyê TUHAD-FED'ê ve tê organîzekirin bi beşdariya komên ji Wan, Îzmîr, Stenbol, Bedlîs, Hatay û Qilabanê hatin, ewilê gihiştin Elîgorê. Malbatên Mahsun Karaoglan û Mustafa Dag jî beşdarî pîrozbahiyan dibin… *R - 5*


## Ji Erdogan re 60 hezar nameyên elektronîk

Piştgiriya ji bo rizgarkirina Heskîfê ji gelek aliyan ve geş û gur dibe. 60 hezar nameyên elektronîk ji Erdogan re hatin şandin. Daxwaza nameyan ew e ku dîroka kevnare Heskîf bi lêkirina bendavê neyê xeniqandin... *RÛPEL - 6*

## Îtirafa Atalay karneya Hikûmeta AKP'ê ye

Di navbera salên 2002 û 2009'an de 74 hezar û 597 çalakî pêk hatine û di van çalakiyan de 24 hezar û 246 kes hatine binçav kirin, 933 welatî, 2 hezar û 76 polîs birîndar bûne, 34 welatî û 3 polîs jî jiyana xwe ji dest dane… *RÛPEL – 4*

## Di nava gemariyê de digevize



Hikûmeta AKP'ê ku li Kurdistanê bi her awayî rewabûna xwe winda kiriye û serî li rêbazên qirêj dide û bi riya çapemeniya xwe ya alîgir şerekî qirêj a psîkolojîk dimeşîne, agahiyên derew belav dike. Li Tirkiyeyê piştî operasyonên Ergenekonê navê Gladioyê dîsa hate rojevê. Gelek nîqaş li ser vê rêxistina şerê taybet û şerê psîkolojîk hate kirin. Ev nîqaş hê jî di rojevê de ye. Di nîqaşan de pirsa gelo Tirkiye dikare Gladioya di nava xwe de ango Ergenekonê deşîfre bike û sûcên ku vê rêxistinê kiriye bidarîzîne? *SEMÎHA ALANKUŞ - R-8*



Samî Tan
sberbeyan@yahoo.com

# Azadiya Welat

Rojnameya Azadiya Welat dîsa ji bo mehekê hate girtin. Dadgerên dewletê qîma xwe bi vê yekê jî neanî piştî rojekê biryareke din a girtinê jî da. Her wiha ji bo Xwedî û Berpirsê Karên Nivîsaran ê Azadiya Welat ê berê Vedat Kurşun bi 500 sal ceza tê xwestin. Ev şermeke giran e. Ji bo gelek siyasetmedarên kurd jî dîsa bi deh hezaran ceza tê xwestin. Ev giş li ser navê hiqûqê tên kirin.

Her wekî tê zanîn peyva "hiqûq" ji peyva "heq" ango maf tê. Lê di qanûnên Tirkiyeyê de ji bo kurdan tu maf nîn e. Bi tenê bi hezaran ceza li wan tê birîn. Her dawî ji bo endamekî Koma Aştiyê ya Mexmûrê jî 15 sal ceza hate xwestin. Li nivîskarê Rojnameya Gunlukê Veysî Sarisozen ji ber nivîseke wî 15 ceza hate birîn. Her wiha bi hezaran siyasetmedarên kurdî ji ber vê hiqûqa dagirkeran di girtîgehê de ne. Rewşa bi sedan zarokên kurd bi serê xwe janeke mezin dixe dilê mirov.

Ev mirov giş ji ber Qanûna Têkoşîna li dijî Terorê tûşî kirinê dijmirovî yên hiqûqa dagirkeran dibin. Berê gelek tişt bêyî qanûn dihatin kirin, niha heman tiştan bi riya qanûnî dikin. Niha bi tenê kuştinan nikarin bi qanûnî bikin. Kuştina bêyî qanûn dikin, lê îcar qanûn kujeran diparêzin. Heta niha gelek mirov hatine kuştin, lê yek kujer ji nehatiye girtin û cezakirin.

Li aliyekî gotinên mîna "Divê em beramberî her leşkerekî xwe yekî/ê ji DTP'ê bikujin." Di çarçoveya azadiya derbirîna ramanê de dê ravekirin, lê gotina "birêz Ocalan" wekî sûc tê dîtin. Hiqûq bingeha dadê ye, heke di hiqûqê de dad û maf nîn bin, ew ne hiqûq e.

Ev rewş rastiya hiqûqa dagirkeran li ber çavan radixe. Em vê yekê dizanin û dibînin, lê hê jî hinek dixwazin ku em çavên xwe ji vê yekê re bigirin û piştevaniya paketa AKP'ê bikin. Ev yek jî li ser navê demokratiyê tê kirin. Li gorî baweriya min ev şermeke giran e. Divê em bi tu awayî guh nedin, daxwazên bi vî rengî û dev ji doza xwe ya têkoşîn û azadiyê bernedin.

***

Bi rastî min dixwest di vê nivîsê de hinekî qala dîroka Azadiya Welat bikim, lê belê mijara ber bi aliyekî din de çû. Dîsa jî ez der barê dîroka rojnameyê de çend tiştan bibêjim, lewre roja 2'yê avrêlê nivîsek di Azadiya Welat de hatibû weşandin, bi rastî gelek şaşî tê de hebûn. Heta mirov dikare bibêje wekî pêkenokê bû. Hema bibêje agahiyan rast tê de tunebû. Bo nimûne Mazhar Gunbat bûbû, Mazhar Gunbakan, Duzgun Denîz bûbû Huseyîn Denîz. Ew çi malkambaxî bû, min fêm nekir. Wekî din jî gelek bûyerên ku ji devê min hatibûn dayîn jî şaş bûn. Dîtina van agahiyan ne tiştekî zehmet e, her wiha rojnamegerî hinekî ked û baldariyê dixwaze, dema mirov ji devê yekî tiştekî digire, divê mirov wan rast binivîse, heke pêwîst bike piştî nivîsandinê mirov ji xwediyê/a gotinan re bişîne da ku tiştên şaşomaşo derkevin. Lewre jî qet nebe ez dixwazim hinek agahiyên giştî li xwarê rêz bikim.

**Rojnameya Welat**

Di 22'yê reşemiya 1992'yan de dest bi weşanê kir, 115 hejmar derket. Di sala 1994'an hate girtin. Xwediyê wê Zubeyîr Aydar, gerînende Abdullah Keskîn, berpirsê karên nivîsaran Mazhar Gunbat e. Piştre Mazhar Gunbat bû gerînendeyê rojnameyê jî.

**Welatê Me**

Di sala 1995'an de dest bi weşanê kir. 46 hejmar hatin weşandin. Xwediyê wê Aynur Bozkurt, gerînende Mazhar Gunbat, berpirsê karên nivîsaran Mehmet Gemsîz (Zana Farqînî) ye. Piştre Metîn Aksoy bû berpirsê karên nivîsaran.

**Azadiya Welat**

Di 21'ê rêbendana 1996'an de dest bi weşanê kir. Xwediyê wê Celalettîn Yoyler, gerînendeyê yekemîn Zana Farqînî (1996-1997), berpirsê karên nivîsaran ê pêşîn Duzgun Denîz bûn. Piştre Samî Tan bû gerînende (1997-2005), di navberê de demekê Evîn Ronî, demekê jî Cemîl Oguz gerînendetî kir. M. Nurî Karakoyun, Suat Ozalp jî xwedîtiya rojnameyê kir. Berpirsên karên nivîsaran, M. Salîh Taşkesen, Salih Turan, Suat Ozalp, demekê jî hevalekî bi navê Tahsîn berpirsiya karên nivîsaran kir.

**Kovara Pîne**

Di kewçêra 1999'an dest bi weşanê kiriye. Xwedî M. Nûrî Karakoyun, berpirsê karên nivîsaran Abdurrahman Pekedîs, gerînende Mazlûm Dogan e. Hinek hevalên mîna Dogan Guzel, Îmam Cîcî, Rewhat, Camêr jê re xêz çêdikirin.



# Hest û ramanên nû hîs dikin

Keça ÇIYA - BEHDÎNAN / ANF

Gelek kesan dîmen û wêneyên gerîlayan temaşe kirine û nivîsên li ser wan bi kêfxweşî xwendibin, lê belê heqîqet tenê ne di dîmen û nivîsê de ye. Heqîqeta mezin di jiyan ew dijîn de ye.

Ji dûr de bedewbûn û xweşikbûne gerîla nayê dîtin û hiskirin, heta ji dûr de gerila weke xeyal tê dîtin û her kes xeyal dike gerîla çawa li çiya dijîn. Lê belê gerîla mirovên têkoşîn dikin çi bi dijmin re û çi jî bi kesayeta xwe re, heta bi sarbûne zivistanê û germbûne havînê re jî têdikoşin. Ev têkoşîna hevaltiyê PKK'ê dide parastin, û her tim hevaltiye gerila di zoriyê de xurt dibe û bi wate dibe.

Hest û ramanên gerîlayên nû yên der barê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan çi ne, me xwest bi we xwendevanên hêja re parve bikin.

> Hin şervanên azadiyê yên ku nû tevli refên xwe bûne nêrîn, daxwaz û hestên xwe yên ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tînin ziman û sedemên tevlibûna xwe vedibêjin

Xebatkar Azad: Rêberê min ez nizanim nameyeke layiqî mezinbûna we binivîsinim. Dema min pênûs girt nave eşqa bê dawî de û hêviya dîtine we ez ketim nava heyecaneke germ, li hemberî azamet û bexteweriya we. Ev 12 sal in, hûn li Îmraliyê dijîn û li ber xwe didin, her rojeke ser mayîna te ya di wî cihî de derbas dibe, dilê me parçe parçe dibe. Her mirovekî kurd ketiye ferqa erk û wezîfeyên ji wan tê xwestin, lewra her kes di nava hewldanekê de ye ji bo bikaribin erkê xwe bicih bînin. Em gerîla jî roj û şev bi te re dijîn û dixwazin heya dawî warê azad biparêzin, û wekî şehîd Muslum Doxan bibin bersiv ji Rêberê xwe re.

Bilind Milî: Rêberê min, êdî her kes dizane mirovekî weke te heya dawî li ber xwe dide ji bo gelê xwe. Heta zarokê kurd jî bê teredûd xwe dikin qurban ji bo rêberê xwe, ev ruhê gerîla ê fedaî û hevaltiye wan moralekî mezin dide min. Mayîna te ya li Îmraliyê ji bo me gelek zor e û tê wateya bê hurmet nêzîkbûn e ji gelê kurd re. Em vê nêzîkatiya dijmin şermezar dikin.

Bahoz Mexmûr: Rêberê min ji wargehên azad ez silav û hezkirine xwe ji bo we rê dikim û bi hesrete dîtine te, ez te hembêz dikim. Ez nû beşdarî şoreşê bûme û hatine çiya ji bo min gava yekem e ji bo têkoşînê û xwe naskirinê. Wekî ciwanekî kurd ez gihîştim vê baweriyê ku cihê hemû ciwanên kurd li çiya ye, ji ber li vê derê em dikarin azad bijîn û bibin xwedî hêz û îradeyeke serbixwe.

Hedar Dêrik: Rêberê min ez nû beşdarî şoreşê bûme û hatine çiya ji bo min serkeftineke mezin e, êdî ez dikarim weke jineke xwedî îrade bijîm. Piştî hatine çiya min hîs kir, ez însan im û mafê min ê jiyanê heye. Li çiya min tama jiyanê hîs kir û bedewbûne wê min dît û jiya. Ez pir dilşad im ku niha ez li çiyan dijîm. Her ciwaneke kurd cihê wê li çiya ye, û pêwîste her keçeke kurd xwedî li îradeya xwe derkeve. Û pêwîst e em hemû ciwanên kurd ruhê şehîd Muslum Doxan bidin jiyîn li çiya û bibin şopdarên riya wî.


Viyan Afrîn: Rêberê min dema ez di nava sîstema dijmin de bûm her roj min felsefeya mirinê dijiya, ji ber ku xweşikbûne jiyanê di çavê min de nemabû. Bi destê dijmin û zilam her roj tu tê kuştin di hest û mêjiyê xwe de lewra pir jin di civakê de mîna dînan li wan tê, hingî zilm û zordariyê ji destê dijmin û zilam dixwin.

Berxwedaniye te li Îmraliyê hêz da min ku ez qîr bikim û mafê xwe ê jiyanê bixwazim. Niha li wargehên azad min nefeseke kûr kişand û bêhna azadiyê min kişande cerg û hinavê xwe. Ez her rojeke ku dijîm li çiyan ez hîs dikim, dinya hemû bûye milkê min, min tu carî ev ruh di nava jiyana sîstemê de nejiya ye. Ez pir dilşad im ku niha di nava gerîlayan de dijîm û dixwazim hemû keçên kurd werin li çiya bijîn.

Gulan Sason: Rêberê min dema ez di nava civakê de bûm, her dem ez di nava tirsê de dijiyam, ji ber jin pir zêde têne tecawizkirin û kuştin, êdî jiyan li ber çavên min reş bûbû. Di hêleke dîtir de jî dijmin gundê me şewitand û her roj êrîş dikirin li ser mala me û me lêdan dixwar ji destê wan, lewra min didît dijmin mafê me yê jiyanê nehiştiye û her dem jiyana wekî kole qedera me bû. Piştî ez hatim çiya êdî rehet dijîm, ez poşman bûme ku hîn zûtir nehatime çiya û min ew qasî emrê xwe vala derbas kir li wê sîsteme qirêj.

Qehreman Rodî: Rêberê min ez silav û hezkirine xwe ji te re rê dikim, her dem meraqa min heya ku ez te bibînim û te hembêz bikim. Dema ez hatim nava gerîla, min dît gerila ji tiştekî natirsin û ne tenê li hemberî dijmin şer dikin, her wiha li hemberî rewşa hewayê jî şer dikin, ne berf ne jî serma jiyana wan dide seknandin, li hemberî zoriye bê çare namînin, û bi hêza xwe her tiştî dikin. Ev hêzeke mezin da min. Bedewbûna gerîla yên ku dixwaze bibîne ancax bi xwe bijîn heya ku jiyana gerîla ku çawa dijîn bibînin dê bedewbûna gerîla hêj nû fêm bikin.

## XAÇEPIRS



**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye?... Pisîkê nêr **2.** Bajarekî me ku bi sûrên xwe navdar e... Bi qasî cûtina carekê benîşt **3.** Bi erebî "ez" **4.** Kesê ji dê an jî ji bavê mirovî... Beyreq, sembola welatan **5.** Agir... Cama mîkroskopê... Notayek **6.** Cure, celeb... Banga ji bo nimêjê **7.** Teref **8.** Xwarina sereke... Navê danseka brezîlyayiyan **9.** Kar û xebat... Pêvedana bi hesinekî sincirî... Rojek

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Qumaşê ku ji hiriyê çêdibe... Cephe, bere **2.** Kurteya ajansa fermî a Tirkiyeyê... Kurteya rêxistina rizgariya Îrlandayê... Cihê herandinê **3.** Tiştê ku tehma wî tehlokî, tirşokî û qemitokî... Bajarekî me **4.** Kurtebêja Ksenonê... Helale, lale **5.** Beşeke malê, jûr... Pêxemberek **6.** Mektûb... Baneşana keserê **7.** Dema mirinê... Cihê lêdanîna koçeran **8.** Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin... Jin an jî mêrê ku hevsera/ê wî/wê miriye **9.** Temen... Beşer, mirov

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | S | S | ■ | A | X | ■ | S | A | R |
| 2 | A | B | A | J | Û | R | ■ | F | A |
| 3 | X | ■ | J | ■ | Z | E | N | E | ■ |
| 4 | ■ | Ş | O | Ş | ■ | N | ■ | T | A |
| 5 | D | Û | ■ | E | L | Î | F | ■ | W |
| 6 | U | ■ | Î | R | O | ■ | A | S | A |
| 7 | H | E | C | Î | ■ | A | L | A | ■ |
| 8 | ■ | S | A | F | Î | R | ■ | K | Ê |
| 9 | Ç | A | R | ■ | D | Î | R | O | K |

ROJEV
Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ Yazı işleri Müdürü: Mehdi TANRIKULU
Yönetim Yeri: Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No:9 Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88
Yayın (Weşan) TEL: 0 (412) 237 48 90-91
Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı (ÇAP): Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Küçükçekmece / İstanbul Tel: 0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstiklal mah. İstiklal. Cad. No: 44 Seyhan / Adana
Yaygın süreli yayındır.

# Ji ber 'Dowîza nayê zanîn' hate girtin!

**Dadgehên tirk mora xwe li biryarên sosret didin. Mamosteyê bi navê Sedat Ertaş ji ber 'dowîza naveroka wê nayê zanîn' li dibistanê hate binçavkirin û piştre jî hate girtin. Egîtîm Senê li dijî girtinê nerazîbûn nîşan da**

Li 5'emîn Dadgeha Cezaya Giran a Amedê ji Mamosteyê Matematîkê Sedat Ertaş re, ku li Dibistana Suleyman Demîrel a Qoserê mamostetî dikir, bi îdiaya "Dowîza naveroka wê ne diyar" hilgirtiye salek cezayê girtîgehê da. Ertaş, piştî biryara cezaya wî hate erêkirin, di nava dersê de ji aliyê polîsan ve hate binçavkirin û piştre jî hate girtin.


Doza der barê Mamosteyê Matematîkê yê bi navê Sedat Ertaş de ku dema xwendekar bû vebibû bi dawî bû. Der barê Sedat Ertaşê ku dema li Fakulteya Perwerdehiyê ya Zanîngeha Sêrtê dixwend, bi sedama tevli daxwayaniya piştî gireva birçîbûnê ya ji bo şermezarkirina mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a ji aliyê Komeleya Malbatên Girtiyan a Sêrtê (STHAYDER) ve hatibû lidarxistin dowîz vekiribû, doz hatibû vekirin. Doz di 24'ê çileyê sala 2006'an de hatibû vekirin. Di doza ku 28'ê nîsana sala, 2009'an bi dawî bû de Ertaş, bi îdiaya "Propagandaya rêxistinê kiriye" salek ceza girt. Piştî ku cezayê Ertaş yê niha li Dibistana Suleyman Demîrel a Qoserê Mamosteyê Matematîkê ye, li dadgeha bilind hate erêkirin, polîsan ew ji nava polê girt û şandin girtîgehê. Her wiha dadgehê Ertaş ji mamostetiyê û endamtiya sendîqayê jî men kir.


**'Dozgeriyê beraat xwest'**

Dozgeriyê di mutaalaya xwede xwest ku "Ji ber, ji bo sucdarkirina wan têr delîlên rast tunene" bila bersûc li gorî Xala 223/2 a Qanûna CMK'ê bên beraatkirin. Ertaş ji di danîşînê de hemû sûcdarkirnan red kiribûn û beraata xwe xwestibû. Lê piştî ku Ertaş serî li dadgeha bilind dabû û ev 4 salin mûmelayan dom dikir, ceza hate erêkirin. Ji ber ku ceza hatiye erêkirin Ertaş duh nîvro ji aliyê polîsan ve di dema ku dikete dersê hate binçavkirin û piştî muameleyan ew birin Girtîgeha Nivvekirî ya Qoserê.

**Ji Egîtîm Senê nerazîbûn**

Nûnertiya Egîtîm Senê ya Qoserê nerazîbûn nîşanê bûyerê da û diyar kir ev 4 salin Ertaş serî li dadgeha bilind daye, lê di nivîsa ku dadgeha bilind ji wî re şandiye de tê gotin ku wî serî li dadgeha bilind nedaye. Nûnertiye, destnîşan kir ku ji ber vê hewldanê hem Ertaş hem jî xwendekar mexdûr bûne û pêwîste ku ev mexdûrî ji holê bê rakirin. **(MÊRDÎN / DÎHA)**





| | |
|---|---|
| SANIK | :13-MÜBAREK YILMAZ: İlhan ve Hediye oğlu, 01/03/1987 ERUH doğumlu, SİİRT, ERUH, GEDİKAŞAR nüfusunda kayıtlı Şeyh Şerafettin Cad. No:174 Merkez/SİİRT adresinde oturur. |
| VEKİLİ | :Av.ABDULHEKİM GİDER: Güres Caddesi Tekin Apt. Kat 1 No: 2 SİİRT |
| SANIK | :14-SEDAT ERTAŞ: Mehmet ve Raveyda oğlu, 02/08/1987 KIZILTEPE doğumlu, MARDİN, KIZILTEPE, DİKMEN nüfusunda kayıtlı. Siirt Eğitim Fakültesi Matematik 2. Sınıf Öğrencisi, |
| VEKİLLERİ | :Av.OSMAN ÇELİK: Elazığ Cad. Zorlu Apt. Yenişehir/DİYARBAKIR |
| SUÇ | :Terör Örgütü Propagandası Yapmak |
| SUÇ TARİHİ | :24/01/2006 |
| SUÇ YERİ | :SİİRT/MERKEZ |
| KARAR TARİHİ | :28/04/2009 |

*Yukarıdaki açık kimliği ve üzerine atılı suçu yazılı sanıklar hakkında, Türkiye Cumhuriyeti Anayasasının 9. maddesine göre Türk Milleti Adına Yargı Yetkisini kullanan bağımsız Diyarbakır 5. Ağır Ceza Mahkemesince (CMK. 250 madde ile yetkili) usul ve ceza yasalarına uygun olarak yapılan kovuşturma (yargılama) sonucunda;*

## Li mexdûrên bûyerê doz hate vekirin

Der barê 9 rêveberên DTP'a hate girtin a Îzmîrê de ku di konvoya pêşwazîkirina Hevserokê DTP'ê Ahmet Turkê ji siyasetê menkirî, di 22'ê mijdara 2009'an de li Îzmîrê rastî êrîşê hatin de, doz hate vekirin. 9 rêveberên DTP'ê 2 meh berê di çarçoveya lêpirsînê de îfade dabûn Midûriyeta Polîsan a Îzmîrê.

Hevserokê DTP'a hate girtin Ahmet Turk, di çarçoveya gera herêma Egeyê de di 22'ê mijdara 2009'an de çûbû Îzmîrê. Wê rojê konvoya ku ji bo pêşwazîkirina Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, çûn balafirgehê di vegerê de rastî êrîşa komek nijadperest hatin.

**Lêpirsîn hate vekirin**

Piştî bûyerê der barê 9 rêveberên DTP'a ku hatiye girtin a Îzmîrê de li Midûriyeta Polîsan a Îzmîrê lêpirsîn hate vekirin. Piştî lêpirsînê derbarê 9 rêveberên berê ku Seroka DTP'a Îzmîrê Mukaddes Kubîlay jî heye, li Dadgeha Asliye Cezaya Îzmîrê doz hate vekirin. Dozgerê Komarê ya Îzmîrê îdîayên "Di konvoyê de dirûşme berz kirine, sirûdê kurdî xwendine û wêneyê Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan vekirine" sedem da nîşan.

**Bi zimaneke din axivîne**

Di îdianameyê de hate diyar kirin ku "ketine nava faliyetên li dijî partiyên siyasî", "Li dijî yekitiya dewletê û li dijî qedexeyan tev geriyane û pesnê Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan dane" û "Ji bilî tirkî bi zimanekî din axivîne".

**Nerazîbûn nîşan da**

Hevseroka BDP'ê ya Îzmîrê Mukaddes Kubîlay, bertek nîşanî vê yekê da û anî ziman ku li aliyekî mexdûr dibin û li aliyê din bi ser mexdûriyeta wan de doz tê vekirin.

Kubîlay, anî ziman ku wan der barê polîsan de gilî kirine û di serlêdana xwe de bi gotina "Pêdivî bi lêpirsînê tune" biryara bêşopandinê dane. Li şûna kesên sucdar bên darizandin em tên darizandin. **ÎZMÎR**

## Careke din darizandina kujeran xwestin

ÎHD'a Amedê, di hefteya 60'emîn de çalakiya "Bila winda bên dîtin, kujer bên darizandin" li ber Abîdeya Mafên Jiyanê ya li Parka Koşuyoluyê li dar xist. Li Stenbolê jî Dayikên Şemiyê aqûbeta windahiyan pirsîn.

Di daxuyaniyê de pankarta "Bila winda bên dîtin, kujer bên darizandin" hat vekirin, dowîzên "Dibêjin JÎTEM tune ye, vayê belgeya wî", "Bila darbeyên li rojava tên plankirin û li rojhilat pêk tên, bên ronîkirin" û "Ev mirov li ku ne" û wêneyên windahiyan hatin hildan.

Di daxuyaniyê de Sekreterê ÎHD'ê Burhan Zorooglu bi kurtasî axivî û diyar kir ku ew wekî parêzvanên mafên mirovan dixwazin kujer bên darizandin û wiha axivî: "Armanca têkoşîna me ya bi salan jî ev e. Bila her kes vê yekê baş zanibe. Bang û daxwaza me dîtina windahiyan e." Zorooglu li ser nîqaşên guherandina makezagonê(!) jî rawestiya û wiha lê zêde kir: "Dê guherîneke kambax a wekî 12'ê îlonê pêk bînin. Divê wiha nebe. Em guherîneke bi vî rengî naxwazin. Ev guherîn di nav gel de jî bi erênî nayê nirxandin. Em dixwazin ku guherîna wê li gorî xwestek û pêdiviyên gel pêk bînin."

Zorooglu, bal kişand ser rewşa nexweşiya Şaredarê Sûrê Abdullah Demirbaş jî û wiha pê de çû: "Ew ne hikûmxwar e, girtî ye. Ji ber vê yekê jî darizandina wî bi hêsanî dikarin ji derve bikin. Divê bê berdan û dermankirina wî ji derve ve bidome." Piştî axaftinan, çîroka Ahmet Şahin ê di 1993'yan de hat binçavkirin û piştre jî jê tu agahî nehatin girtin, hat vegotin.

**Dayik dîsa rûniştin**

Li Stenbolê jî Dayikên Şemiyê cara 262'yemîn li ber lîseya Galatasarayê çalakî li dar xistin. Di çalakiya vê hefteyê de dayikan aqûbeta zarokên ku ji aliyê dewletê ve hatiye windakirin pirsîn. Her wiha çîroka bav û dayikên ku li zarokên xwe digerin û hatine windakirin hate vegotin. Endama ÎHD'ê Leman Yurtsever çîroka dayik û bavên ku li zarokên xwe geriyane xwend. Yurtsever got ku li Tirkiyeyê 30-40 sal in dayik û bav ji bo ku zarokên xwe bibînin têdikoşin. Piştre birayê Ridvan Karakoç daxuyanî xwend. Karakoç got ku li cografyaya kurdan bi hezaran kes ji aliyê hêzên dewletê ve hatine windakirin. Her wiha Karakoç piştre jî çîroka windakirina Bedrî Algan ê di 25'ê çileya 1995'an de li gundê Gomana Hezroyê hate binçavkirin û piştre hate windakirin vegot. **AMED / STENBOL**



## Qetilkirina Tamçoban şermezar kirin

Komeleya Mafên Mirovan a (ÎHD) Amedê qetilkirina zarokê bi navê Mehmet Nuri Tamçoban (14) a ji aliyê leşkeran ve hate qetilkirin, li ber Abîdeya Mafên Mirovan bi çalakiya rûniştinê şermezar kir.

ÎHD'a Amedê bi armanca şermezarkirina qetilkirina Mehmet Nuri Tamçoban ku li gundê Xecîxatûna navçeya Ebexê ya Wanê ve, şermezar kir. ÎHD'ê bi boneya kuştina Tamçoban a ji aliyê leşkeran ve li ser sînorê Îranê pêk hat, çalakiya rûniştinê ya ji bo saeteke li dar xist. Rêveberên ÎHD'ê û bi dehan kes tevlî çalakiyê bûn. Di çalakiyê de dowîzên "Bila kujerên Mehmet Nuri hesab bidin", "Dest medin zarokên me", "Zarokên kevir diavêjin, tên girtin. Lê yên mirovan dikujin..." û "Zarok pêşeroja me ne" hatin hildan. Beriya çalakiyê, Rêvebera Şaxa ÎHD'ê Rahşan Bataray helbesteke Ece Ayhan a bi navê Peykara Xwendekarê Winda xwend. Beşek ji helbesta Ayhanê wiha ye: "Li vir binêrin! Li vir, di bin ev mermerê reş de, Heke tenefuseke din jî sax bimana... Zarokekî ku dê ji nav xwezayê rabe ser depê veşartî ye! Ew jî di dersa dewletê de hatiye kuştin..."

Bataray, piştî helbestê axivî û got ku ew careke din bi minasebeta kuştina zarokekî kurd li vir civiyane û wiha axivî: "Mehmet Nuri jî wekî heman hevalên xwe bi destê hêzên ewlehiyê yên dewletê hate kuştin. Hêj ku me mirina Ceylan Onkolê ji bîr nekiribû ev bûyer qewimî. Hêj ku Ceylanê wan çavên xwe yên reş ji ser me ranekiribû, ev bûyer qewimî." Pişre Burhan Zorooglu axivî. Zoroolglu destnîşan kir ku ew bi armanca şermezarkirina qetillkirina Tamçoban a ji aliyê dewletê ve li vir civiyane û ew vê yekê bi tundî şermezar dikin. **AMED**

## Dadger gotina xwe pêk anî

Welatiya bi navê Rihan Yildiz, ji ber ku di hin çalakiyan de dirûşme berz kirine, bi îdiaya "Propagandaya rêxistinê kiriye" û "Endamê rêxistinê ye" 9 sal û 7 meh ceza girt. Yildiz a li Girtîgeha Tîpa E ya Amedê tê girtin ji ÎHD'a Amedê re nameyek şand.

Yildiza ku nexweşiyên astim, dil û hipertansiyonê lê heye di nameya xwe de diyar dike ku ewlehiya wê tuneye. Yildiz, got ku dema hatiye binçavkirin û ew derxistine dadgehê dadger ji wê re gotiye, "Here 8 sal di girtîgehê de bimîne ku aqili te bê serê te. Tu ji wir bi saxî dernakevî." Yildiz, destnîşan kir ku darizandin listikek bû.Yildiz, di nameya xwe de wiha dibêje: "Nexweşiyên wekî penceşêr, hîpertansiyon, astim, şekir, kolestrol û hin nexweşiyên din li min hene. Mercên girtîgehê nexweşiyan girantir dike. Beriya niha min 2 caran ji ber, penceşêr cerekî ji ber apendîsîtê û carekî jî ji ber safrayê emeliyat bûm. Em 18 kes di odeya ku ji bo 8 kesan hatiye çêkirin de dimînin. Ji ber qelebalixê nikarim baş nefes bigirim. Ez jî malbata min jî gelek maxdur in." **AMED**

## Ava 'nayê vexarin' vedixwin

Taxa Yeroklu ya li ser bajaroka Anzara bi ser Mûşê, welatiyên ku pirsgirêka avê dijîn; ji ava ku rapora wê ya "nayê vexwarin" heye, vedixwin. Welatiyan, diyar kir ku tu encam ji serlêdanên li walîtî û şaredariya bajarokê re hatine kirin, negirtine.

Welatiyên li taxa Yeroklu ya li ser bajaroka Anzarê ji ber ku li bajarokê şebekeya avê tune ye pediviya avê ji kaniya Oluklu bi cih tînin. Welatiyên, ji vê kaniya ku li gorî rapora Hifzisihayê ku dibêje "av nayê wexwarin" av vedixwin, ji bo pirsgirêka wan bê çareserkirin serî li Walîtiya Mûşê dane, lê tu encam negirtine. Şaredariya Bajarokê jî rojê tenê nîv saet av dide bajarokê. Ji ber vê jî li bajarokê pirsgi- rêka avê derketiye asta herî jor. Welatiyên li taxa Yeroklu, diyar kirin ku li taxa wan ji ber ava kaniya Olukluyê hejmara kesên ku kor dibin gelek bilind e.

Muxtarê taxê Seyîthan Kotan got ku heyet ji walîtiye hatiye û ji avê nimûnê girtine, lê heta niha tu kesî tiştek ji wan re negotiye. Kotan, ji bo pirsgirêka wan bê çareserkin ji hemû rayedarên dewletê alîkarî xwest û da zanîn ku li gel pirsgirêka avê, pirsgirêka rê jî dijîn. **MÛŞ**

www.arsivakurdi.org

# Li Bruksêlê bi hezaran kes meşiyan



## Di serî de ji Hollanda, Fransa, Swîsre û Belçîkayê bi hezaran kurdistaniyên ku li Bruksêlê li hev civiyan, operasyonên li hemberî sazî û siyasetmedarên kurd pêk tên bi girseyî şermezar kirin. Kurdistaniyan got, 'nebin şirîkên komkujiyê'

Bi hezaran kurdistaniyên li welatên cur bi cur ên Ewropayê dijîn li paytext Bruksela Yekitiya Ewropayê li hev civiyan û zordestiya li welatên Ewropayê li hemberî siyasetme- darên kurd tê meşandin protesto kir.

Hemû kurdisaniyên ku pêr bi otobûs û wesayîtên taybet berê xwe dan Bruksêlê zextên li ser siyasetmedar û saziyên kurdan pêk tên protesto kirin. Bi hezaran kurdistaniyên ji Hollanda, Fransa, Swîsre û Belçîkayê li Gare du Nord a Bruksêlê civiyan meşa xwe dan destpêkirin.

Kurdistaniyên li pey pankanta 'Nebin şirîkên komkujiya siyasî û çandî ya li hemberî kurdan' operasyonên di serî de li Belçîka, Fransa û Îtalyayê li hemberî sazî û siyasetmedarên kurdan pêk hatîn protesto kirin.

**Alên ERNK'ê hatin hilgirtin**

Li pêşiya korteja meşê 4 dayikên kurdistanê wêneyekî mezin ê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hildan. Di kortejê de derketina pêş a alên Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê (ERNK) bal kişand.

**Aydar û Kartal jî meşiyan**

Her wiha meşvanan alên PKK'ê û posterên Ocalan hilgirtin. Dîsa dowîzên ji logoya ROJ TV'ê pêk tên jî di destê meşvanan de bilind bûn. Serokê KONGRA GEL Remzî Kartal, Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Zubeyîr Aydar jî di nav de gelek siyasetmedarên kurd û parlamenterekî suryanî jî di kortejê de cihê xwe girt.

Komeke alîgirên Partiya Marksîst-Lenînîst a Komûnîst (MLKP) li pişt parkarta 'Dawî li operasyonên emperyalîst ên li hemberî gelê kurd bînin' meşiyan û piştgirî da meşê.

**'Kurdan krîmînalîze nekin'**

Girseya ku parkarta 'Krîmînalîze kirina gelê kurd sûcê mirovahî ye' hilgirtî, ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan "Jiyana te jiyana me ye" pankartek hate hilgirtin.

Ligel ku baraneke bê eman dibarî, dîsa jî kurdistaniyan dest ji meşê berneda. Di vê navberê de polîsên belçîkî bi hin hewldanên xwe xwestin girseyê tehrîk bikin.

**Ewropayê rexne kirin**

Kurdistaniyên li Bruksêlê civiyan operasyonên li hemberî sazî û siyasetmedarên kurd lanet kirin. Di axaftinên hatine kirin de durûtiya welatên Ewropayêya li hemberî gelê kurd hate rexnekirin û hate gotin ku welatên Ewropayê bûne şirîkên polîtîkaya înkar û îmhayê ya ji aliyê dewleta tirk ve tê meşandin.

**Li Krasnodarê pîrozbahî**

Li aliyê din bi li bajarê Krasnodara bi ser Federasyona Rûsayayê ve ji bo pîrozbahiya Newrozê û hefteya qehremaniyê li hev civiyan piştgiriya xwe ya ji bo PKK'ê anîn ziman. Serokê Otomiya Çandî ya Kurd a Krasnodarê Îshxan Aslonav di pîrazbahiyan de axaftinek kir û got ku heke li hemberî PKK'ê operasyoneke dersînor pêk bê ew ê ligel PKK'ê dest bi şer bikin. **BRUKSEL -KRASNODAR**




## Îtirafa Atalay karneya Hikûmeta AKP'ê ye

Wezîrê Karên Hundir Beşîr Atalay, got ku di navbera salên 2002 û 2009'an de 74 hezar û 597 çalakî pêk hatine û angaşt ku ji van 10 hezar û 658 li dijzagonan bûne. Atalay, anî ziman ku di van çalakiyan de 24 hezar û 246 kes hatine binçav kirin, 933 welatî, 2 hezar û 76 polîs birîndar bûne, 34 welatî û 3 polîs jî jiyana xwe ji dest dane.

Pirsiyarnameya di derbarê lîncên li ser çalakiyên demokratîk de ku ji hêla Wekîla Serokê Koma BDP'ê ya Meclîsê û Parlamentera BDP'ê yê Êlihê Ayla Akat Ata ve hatibû dayin ji hêla Wezîrê Karên Hundir ve hate bersivandin. Wezîr Atalayê ku gelek pirsên di pirsiyarnameyê de bêbersiv hîşt, diyar kir ku di navbera salên 2002 û 2009'an de 74 hezar û 597 çalakî pêk hatine û angaşt ku ji van çalakiyan 10 hezar û 658 li dijzagonan bûne. Atalay, daxuyand ku di van çalakiyan de 24 hezar û 246 kes hatine binçav kirin, 933 welatî, 2 hezar û 76 polîs birîndar bûne, 34 welatî û 3 polîs jî jiyana xwe ji dest dane. Wezîr Atalay, pirsên wek, "Kesên ku buyerên lincên kirine çend kesin? Ji van çend kes hatine binçavkirin? Di der barê çendan de lêpirsîn hatiye li dar xistin û hêjmara kesên kû piştî rastî lîncê hatine û ketine binçav çiqas in?" bêbersiv hîşt.

**Tenê ji leşkeran îfade girtin**

Her wiha pirsiyarnameya Parlamentera BDP'ê ya Şirnexê Sevahîr Bayindir a di derbarê gulebarandina dolmîşa welatiyê bi navê Hecer Oslu ku di 7'ê adar'a 2010'an de pêk hatibû û piştî êrîşê jiyana xwe ji dest dabû jî ji hêla Wezîr Atalay ve hate bersivandin. Atalay, diyar kir ku di derbarê buyerê de ji hêla Dozgeriya Qilabanê ve lêpirsîn hatiye destpêkirin û got ku lêkolîna li cih di 8'ê Adarê de di navbera saetên 10.00 û 12.30'an de pêk hatiye û rapor jî ji hêla Qomûtaniya Cendermeyan a Şirnex ve teslîmî Dozgeriya Qilaban hatiye kirin. Atalay vegot ku piştî îfadeyên şahidan tu personelên ewlehiyê nehatine binçav kirin û îfadeyên 7 personelên ewlehiyê ku di dema buyerê de li wir bûne hatine sitendin. **(ENQERE / DÎHA)**

## Kongreya Şaxa ÎHD'ê ya Wanê

Şaxa Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Wanê kongreya xwe ya awarte pêk anî û kongreyê Prz. Mehmet Alî Şen ji bo serokatiyê hilbijartin.

Kongre li Salona Egîtîm Senê pêk hat. Kongreya ku endam û nûnerên saziyên civakî, parêzer û endamên ÎHD'ê amade bûn, bi rêzgirtin û hilbijartina divanê dest pê kir. Di kongreyê de Sekreterê Şaxa ÎHD'ê ya Wanê Cemal Demîr, axaftinek kir û diyar kir ku li Tirkiyeyê binpêkirina mafan zêde bûye. Demîr, bal kişand ser kuştina Mehmet Nûrî Tamçoban û da zanîn ku Tamçoban hatiye înfazkirin. Piştî axaftinan û xwendina raporan, kongre bi yek lîsteyê çû hilbijartinê. Ji bo Serokê Şaxa ÎHD'ê ya Wanê Prz. Şen, ji bo rêveberiyê jî Samî Gorendag, Omer Işik, Serap Mînaz, Onur Sulu, Burhan Bugday û Ridvan Adsiz hatin hilbijartin. **WAN**

## Hinceta Atalay, li çiya pîsta helîkopterê nebû

Wezîrê Karê Hundir Beşîr Atalay, angaşt ku cenazeyê endamê PKK'ê Ahmet Şerîf Karakaya'yê ku di 15'ê gulana 2009'an de di operasyona ku li Sêrtê pêk hatibû de jiyana xwe ji dest dabû, ji ber cihê helîkopter lê deyne tunebû nehatiye hilgirtin. Wezîr Atalay, parast ku ji ber tu sûcê personel tunebuye lêpirsîn jî venekirine.

Pirsiyarnameya Parlamenterê BDP'ê yê Sêrtê Osman Ozçelik ya der barê cenazeyê endamê PKK'ê Ahmet Şerîf Karakaya ku nehatiye dayin de, ji hêla Wezîrê Karê Hundir Beşîr Atalay ve hate bersivandin. Wezîr Atalay angaşt ku di operasyona 15'ê gulana 2009'an de 2 jê jin 7 endamê PKK'ê jiyana xwe ji dest dane û tenê cenazeyên du PKK'iyên jin û muhîmat û çekên wan ji cihê bûyerê hatine hilgirtin û got ku cenazeyên her 5 gerîlayên din ji ber cihê helîkopter lê deyne tune bûye nehatiye hilgirtin. Wezîr Atalay ragihand ku ji bo teslîm kirina cenazeyan tu pêkanîn nehatiye kirin û der barê personelên li heremê di nav buyerê de bûne jî ji ber ku li holê sûc tuneye lêpirsîn nehatiye vekirin.

Di 15'ê gulan'a 2009'an de li Çiyayê Gebarê li devera Çiravê di navbera endamên HPG'ê û hêzên leşkerî de pevçûn derketibû. Bavê Karakaya Mehmet Karakaya ji Roj Tv agahdar bûbû ku kurê wî di wê operasyonê de jiyana xwe ji dest daye û di 21'ê gulan'a 2009'an de ji bo cenaze bigire serî li Dozgeriya Dihê dabû. Karakaya, diyar kiribû ku di dîmenê ku ji hêla leşkeran ve hatibû kişandin de kurê wî û ligel 4 hevalê wî di şkeftekê de tenê cihê guleyan di serê wan de hebuye. Bi guman bûye ku dibe piştî bi kîmyasalê hatibin kuştin gule berdabin serê wan. **ENQERE**

## Hiqûqnasan piştgirî da pêşniyarên BDP'ê

Hiqûqnasên ku pêşnûmeya ji aliyê Hikûmeta AKP'ê ve hatiye amadekirin kêm ditin, piştgirî dan pêşniyarên BDP'ê. Prof. Dr. Ergun Ozbudun, ku piştî sala 2007'an pêşnûmeya Makeqanûnê ji AKP'ê re amade kiribû, piştgirî da pêşniyarê BDP'ê.

Prof. Dr. Ergun Ozbudun, diyar kir ku bi guhertinên biçûk ên Makeqanûnê pirsgirêk çareser nabe û xwest teqez Makeqanûna Tirkiyeyê bê guhertin. Ozbudun, anî ziman ku nêrînê wî yên der barê guhertina Makeqanûnê de diyar in û wiha got: "Divê Makeqanûn bi tevahî bê guhertin. Divê daxwaz û pêdiviyên civakê li ber çavan bên girtin. Ez pêşniyara BDP'ê ya derbarê rakirina bendava hilbijartinê diparêzim. Bi salan berê min jî heman pêşniyar kiribû. Divê xezine alîkariyê bide partiyên siyasî. Divê ji bo dewlet alîkariyê bide wan sînor daxe bin ji sedî 7'an. Dibe ku niqaş û guhertinê di rojevê tune be. Lê divê hikûmet li gorî daxawzên civakê tev bigere."

Serokê Komeleya Hiqûqnasên Hemdem Selçuk Kozagaçli, jî pêşnûmeya ku ji aliyê AKP'ê ve hatiye amadekirin kêm dît û wiha got: "Ez vê pêşnûmeyê kêm, ne ji dil dibînim. Divê guhertinên têr, ji dil û pêwist bên kirin. Divê Makeqanûna 12'ê Îlonê bi tevahî bê guhertin. Ger ku guhertinên daxwazê civakê di nava xwe de vehewîne em jî dê piştgiriyê bidin." Kozageçli, da zanîn ku pirsgirêkên Tirkiyeyê yên Makeqanûnê mezin in û wiha dom kir: "Di serî de pirsgireka kurd, pirsgirêka kedê û pirsgirêka xizaniyê heye. Kozagaçli, ji bo çareseseriyê xwest alîgir li hev kom bibin û wiha axivî: "Divê nerîn û daxwazên aliyan li ber çavan bê girtin. Em vê pêşnûmeyê yek alî û ji daxwazên gel dûr dibînin." **ENQERE**

## Polîsan qaşo bi pîvan mudaxaleya karkeran kiriye!



Midûriyeta Polîsan a Enqereyê, têkilarî mudaxaleya li hemberî karkerên TEKEL'ê polîs parastin û diyar kir ku di mudaxaleyê de 'li gorî pîvanan zor pêk hatiye" û 15 kesan ji ber bersîv daye polîsan hatine binçavkirin.

Midûriyeta Polisan a Enqereyê, der barê mudaxaleya li hemberî karkerên TEKEL'ê de daxuyaniyek nivîskî da. Midûriyetê di daxuyaniyê de diyar kir ku karkerên endamê sendîkaya Tek Gida-Îş'ê duh li ber Navenda Giştî ya TURK-ÎŞ'ê bê destûr çalakiyê pêk anîne. Midûriyetê di daxuyaniyê de wiha got: "Sendîkaya navborî di 1'ê nîsana 2010'an de bi girseyî hatin bajarê me û li ber Navenda Giştî ya TURK-ÎŞ'ê û li derdorê TURK-ÎŞ'ê heta şevê çalakiyên ku derdor, raya giştî û welatiyan dilzar dike pêk anîne. Di çalakiyê de li dijî polîsan derketine û bersîv dane polîsan. Qada ku karkeran lê çalakî pêk anî ji aliyê Walîtiyê ve wekî qada çalakiyê nehatiye diyarkirin. Koma ku çalakî pêk anî, li gel qedexe û bê destûrê çalakiyê pêk anîn. 15 kesên ku di çalakiyê de hatin binçavkirin, ji ber ku di çalakiyê de bersîv dane polîsan hatine binçavkirin. Mudaxale jî li gorî pîvan û zagonan pêk hatiye." **ENQERE**

www.arsivakurd.org

# Kurdan berê xwe dan Amarayê

Bi 10 hezaran kes, bi boneya beşdarî "Meşa Amara" ku ji aliyê TUHAD-FED'ê ve hatiye organîzekirin, ber bi gundê Amarayê ve herikîn. Ji bo beşdarî meşa bi slogana "Rêwîtiya rojê" ya pîrozbahiya rojbûyina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bibin, bi hezaran kes ji Amedê bi rê ketin û çûn Alîgorê. Li aliyê din bi hezan kes li bajaroka Elîgor a Pirsûsê gihiştin hev.

Li Amedê nêzî 10 hezar kesên li ber avahiya Rêxistina BDP'ê li hev kom bûn bi durûşmeyan konvoya ku ji hezaran pêk dihat ber bi Amarayê bi rê kirin. Komên ku li ber Rêxistinên BDP'ê yên Sûr, Yenîşehîr, Baglar û Peyasê bi hezaran kes ber bi Bajaroka Elîgorê ketin rê. Bi hezaran kesên ku ketin rê û berê xwe dan Amarayê cil û bergên neteweyî li xwe kirin û wesatiyên xwe bi rengên kesk, sor û zer xemilandin.

**ŞIRNEX:** Li Şirnexê jî sedan kes bi armanca birêkirina konvoya "Rêvîtiya ber bi Rojê ve" li ber avahiya Rêxistina BDP'ê ya Şirnexê hatin cem hev. Gel bi wesayîtên taybet, bi 5 otobûs û 10 minîbûsa diçin Amarayê. Ji Silopî û Cizîrê bi nêzî hezar kes bi rê ketin bi nêzî hezar kes bi boneya birêkirina kesên dê tevli meşa "Rêwîtiya ber bi Rojê ve" bibin li ber avahiya Rêxistina BDP'ê ya Navçeya Silopiyê hatin cem hev û bi slogan, çepik û tilîliyan rêwî bi rê kirin.

**SÊRT:** Bi hezar kesên ku dê tevli meşa Amarayê bin li ber avahiya Rêxistina BDP'ê ya Sêrtê li hev civiyan. Beşdarên ku kincên neteweyî li xwe kirine bi 8 otobûs û 80 wesayîtên taybet ketin rê û bi tevlibûna konvoya Êlihê girse bi rê ket.

**DÊRSIM / ELEZÎZ:** Li Dêrsimê ji gelek kes li ber avahiya Rêxistina BDP'ê ya Bajar hatin cem hev û bi minîbûs û wesayîtên taybet ber bi Amarayê ve bi rê ket. Konvoya Dêrsimê bi konvoya Elezîzê ku ji 3 wesayîtan pêk tê, re bû yek rêwîtiya xwe domand.

**MÊRDÎN:** Ji Mêrdînê jî bi hazeran kes ji bo tevlibûna meşa Amarayê derketin rê. Ji navçeyên Nisêbîn, Kerboran û yên din ji bo heman armancê çûn Qoserê. Girseya ku ji 5 hezar kesan pêk tê bi otobus, minîbûs û wesayîtên taybet ve dan rê. **DÎHA**

# Bi deh hezaran kes li Alîgorê ne

## Bi wesîlaya ku rojbûyîna Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan pîroz bikin, bi deh hezaran kes li Alîgorê gihiştin hev. Ji gelek bajaran komên ku çûn Alîgorî bi coşeke mezin hatin pêşwazîkirin



Gelek komên bi mebesta rojbûyîna Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan pîroz bikin, ber bi Bajaroka Alîgorê ya li navçeya Pirsûsê ketibûn rê, Li bajaroka Elîgor hatin cem hev. Bi hezaran kesên ku ji gelek bajar û navçeyan li "Qada 4'ê Nîsanê" gihiştin hev, govend gerandin. Polîs û cendirmeyên ku di daketina qadê de nasnameyan kontrol kirin, li ser riya bajarokê noqteyên lêgerînê saz kirin.

Hin komên ji bo tevlibûna 'Meşa Ber Bi Rojê Ve' ku ji bo rojbûyîna Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a ji aliyê TUHAD-FED'ê ve hatiye organîzekirin, li cihe pîrozbahiyê ya li Bajaroka Alîgora navçeya Pirsûsê gihiştin hev. Polîs û cendirmeyan jî 3 kîlometre durê daketina bajarokê noqtaye lêgerînê saz kir û nasnameyên hemû kesên ji bo tevlibûna pîrozbahiyê hatine navçeyê, kontrol kirin. Her wiha gelek wesayîtên bizirx jî li derdora "Qada 4 Nîsanê" hatin bicihkirin.

**Govend girtin**

Komên ku ji Wan, Îzmîr, Stenbol, Bedlîs, Hatay, Qilabanê hatin, gihiştin Bajaroka Elîgorê ji aliyê girseya Elîgorê ve bi coşek mezin hatin pêşwazîkirin. Girseya ku li zeviya ber Şaredariya Elîgor ku ji aliyê gel ve wekî "Qada 4'ê Nîsanê" tê bi navkirin li hev kom bûn û govend girtin. Hin koman li ber def û zurneyan govend gerandin, hin kesên ji ber riya dûr û dirêj westiya bûn xwe li ser şînahiyê biharê dirêj kirin û bêhna xwe berdan.

Li qada pêşwazîkirinê, dik hate avakirin û li ser dikê pankarta "Rojbûna te rojbûna me ye" û posterê mezin ê Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan li ser dikê hate daliqandin. Dîsa li milên dikê yên çep û rastê posterên Mustafa Dag û Mahsun Karaoglan ku sala par di "Meşa Amara" de jiyana xwe ji dest dabûn hatin daliqandin. Dîsa pankartên "Ji komploya makezagonê re na, ji makezagona demokratîk re erê", "Azadî dê bi Rêber Apo re biser bikeve", "Em ber bi axa ku bi rojê re ronî û azad dibe ve dimeşin" hatin daliqandin. Dîsa di konên hatin vekirin de wêneyên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan hatin daliqandin û pankartên "Em bi şiyariya berxwedana Zîlan, Amara silavdikin", "An çareseriya demokratîk an ji berxwedana bi heybet" daliqandin.

Li aliyê din amadekariyên ji bo pîrozbahiyê bi dawî bûn. Ji bo pêşwazîkirinê bi hezaran xebatkarên Şaredariya Pirsûs û Elîgorê heta serê sibê xebat meşandin. Li qadê kon hatin vekirin û ji bo konserê dik hate avakirin. **(RIHA \DÎHA)**



Mizgîn Bîngol
bingolmizgin@gmail.com

## Ber bi Amarayê

Gelê kurd li Bakur ev çend sal in di roja rojbûna Serokê PKK'ê Abdullah Ocalan de bêrê xwe dide Amarayê. Di 4'ê Nîsanê de ber bi gundê Ocalan ku lê ji dayikê bû ye, 'Amara'yê ve diherikin.

Her ku di nava kurdan de kevneşopiya pirozkirina rojbûna kesan tûnebe jî, kurdan ev roj kirine weke rêbazek ji bo ku nîşanî dost û neyaran bidin; 'ew çiqas bi serokê xwe ve girêdayî ye'. Belkî cara yekem e kurd di jiyana xwe de bi hestên dirokî tevdigerin û bi înad nahêlin dîrok dûbare bibe.

Herdem dewletê tirk serokên serhildanên kurdan avêtine darê, weke Şex Seîd, weke Seyîd Riza bi darvekirina van kesan pesn û methên xwe dane. Dema ku guleya yekem di 15'ê Tebaxa 1984'an hate avêtin tirkan yekem car serhildanên kurdan ên têk çûne anin bêriya kurdan û gotin ev serhildana vê carê jî 'beyhude' ye.

Gelê kurd ev gotina tirkan ji xwe re kiriye înad. Gava Ocalan radestî Tirkiyeyê hate kirin, heger Ocalan pêşî lê negirta dê kurdan Enqere ber bi lingan ve bibira. Ev bi salan in gava dibêjin serê Ocalan dêşe gel radibe ser piyan, dibêjin cihê wî teng kirine kurd radibin serpiyan, tirk dibejin 'serokê teroristan' bi inad kurd dibêjin 'birêz Ocalan'. Bi mîlyonan kurdan, Ocalan kirine navnişana hêviyên azadiya netaweya xwe û her sal bi hezaran kurd ber bi Amarayê dimeşin.

Xwendin û fêmkirina fikrên Ocalan ên di pirtukên Ocalan de zanyarî û konsantrasiyoneke mezin dixwaze. Dema mirov li asta zanina xwendin û nivîsandina kurdan dinêrê, dibîne ku fêmkirina hemû kurdan a ji bo fikr û ramênên Ocalan mimkûn nîn e.

Gel bi praktika tevgera azadiya gelê kurd ku rengê xwe ji bîrdoziya Ocalan digire û gel bi hestên dirokî li dora Ocalan çembera parastinê ava kiriye. Ev çembera berxwedanê ji bo têkoşîna rizgariyê, xaleke pir girîng e ku hest û daxwazên gel li cihekî santralîze (kom) dike û bi awayekî êrîşên dijminên kurdan yên ser li tevgera azadiyê vala derdixîne.

Gel çembera parastinê ya ji bo serokê xwe bi her awayî diparêze û miqabilî wî divê siyaseta kurd di warê hestên gel de pir baldar be. Siyaseteke ku siyasetmedar çi dixwaze, ne siyaseteke li gor pêwistiyên gel divê esas bên girtin da kû çembera parastina ya li dora Ocalan zeîf nebe û bi wî awayî bexwedana gel her zindî bimîn e.

# Parêzerên Ocalan tecrîda Îmraliyê ji DMME'yê re vegotin

Parêzerên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan têkildarî dozên şert û mercên ev 11 salin li Îmarliyê didomin, li DMME'yê hatin vekirin parastin kirin. Parêzeran diyar kir ku hikumetê parêznameyên Ocalan ên ji bo DMME'yê rêkirî astengkirine û bi vê yekê re hiqûq îhlal bûye. Parêzeran, da zanîn ku li gorî xala 34'an a peymanê serlêdana DMME'yê mafekî heq e û bi tu awayî nayê astengkirin. Her wiha disa di parastinan de hate ziman ku Ocalan ev 11 salin dibin tecrîtê daye û rastî pêkutiyên cuda tê. Her wiha parêzeran, da zanîn ku raporên ji aliyê CPT'yê ve hatine girtin, ji aliyê hikûmetê ve nayên dîtin.

Aligiran, di derheqê dozên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ên têkîldarî şert û mercên girtîgehê yên li DMME'yê tên dîtin parastinên xwe kirin. Piştî hikumeta Tirkiyeyê di 25'ê çileyê de parastin kir, parêzerên Ocalan jî parastin kirin. Parêzeran, parastina Tirkiyeyê ya di 25'ê çileyê de bersivand û bal kişandin ser rewşa muvekîle xwe û astengkirina mafê parastinê. Parêzeran da zanîn ku hikumetê jî qebul kiriye ku parêznamêyên Ocalan ên ji bo DMME'yê amadekirî astengkirin û bi vê yekê mafê parastinê îhlal kiriye. Li gorî xala 34'an ya peymanê serlêdana DMME'yê mafekî teqez e û bi tu awayî nayê astengkirin.

**'Bi awayekî aşkera tê astengkirin'**

Parêzeran, daxuyand ku nivîsên di navbera dadgeh û DMME'yê de tên kirin ji aliyê hikumetê ve jî tên xwendin û ev yek îhlal e. Parêzeran, destnîşan kir ku ne pêkan e ku personelên girtîgehê naveroka parasnameyê binirxînin û ev yek peywira dadgerên DMME'ê ve pêk bê. Parêzeran, da zanîn ku heta niha muwekîlê wan 12 caran rastî cezayê hûceyê hatiye û mafê parastinê bi temamî ji dest wî hatiye girtin. Parêzeran diyar kir ku tenê muwekîlê wan mafê îtîrazê bikar aniye ne hiştine ku parêzer tevli vê yekê bibin û hatine astengkirin.

Parêzeran di nivîsa bersivê de jî balkişandin ser rapora CPT'yê ya salên 2007 û 2008'an ya têkîldarî rewşa muwekîlê wan û ya wekî "Girtî di 16'ê sibata 1999'an heta niha di bin tecrîdê tê girtin" Parêzeran wiha got: "Heta niha bilî parêzer û malbatê bi tu kesî re hevdîtin pêk neaniye. Her wiha bi hinceta ewlehî bi parêzerên xwe re jî dest girtin hatiye qedexekirin. Temasa astengkirina fizîkî bi ewlehiyê nayê aşkera kirin û ev yek îzolasyona fizîkiye."

Parêzeran, di nivîsa bersîvê de diyar kir ku muwekîlê wan Ocalan di 17'ê mijdara 2009'an de birine hûcereya nû û şertên wî hêj girantir kirin e. Parêzeran, destnîşan kir ku li ser navê başkirinê merc hîn girantir kirine û wiha dom kirin: "Berê di hûcereyekî 13 metrekareyê de di hate girtin. Hûcreya nû destşo û serşo cuda çêkirine lê cihê ku bi kar bîne daxistine 6 û 7 metrekareyê. Muwekîlê me rojê 22 saetan di vê odeyê de derbas dike. Di navbera doşek û dîwar, 2 û 3 gav heye. Her wiha hewş jî 3 û 5 metreyan fireye û ser hewşê bi têlan hatiye raçandin.

**'11 salin televîzyonê temaşe nake'**

Parêzeran, daxuyand ku mafê muwekîlê wan Ocalan yê televîzyonê jî bi temamî hatiye astengkirin û ev 11 salin bi tu awayî televîzyon temaşe nekiriye. Parêzeran, daxuyand ku girtiyên sewqî girtîgehê kirine televizyonê temaşe dikin. Parêzeran, da zanîn ku hikumetê di bersiva DMME'yê de diyar kiriye ku kesên cezayên heta digirin mehê carekê hevdîtina vekirî û carekê jî hevdîtina girtî dikin û wiha pêde çûn: "Lê ev 11 salin heta niha muwekîlê me tu carî hevdîtina vekîrî pêk neaniye.Disa heta niha tu caran destura nedane ku bi zimanê zikmakî biaxive. Mafê axaftina zimanê zikmakî û hevdîtîna vekîrî asteng dikin." **(STENBOL / DÎHA)**

www.arsivakurd.org

## Li Iraqê 25 kes hatin kuştin

Li gor agahiyên ji rayedarên Iraqî hatine girtin li gundê Sufiya ya herêma Rajab a Bexdayê, ji aliyê kesên ku unîformaya leşkerên iraqî li wan bûye ve êrîşek çekdarî pêk hatiye. Di êrîşê de 5 jê jin 25 endamên ku ji xwe re dibêjin milîsên dijberî El Qaîdeyê hatine kuştin. Ji Wezareta Karên Hundir û Parastinê ya Iraqê daxuyanî hate dayîn. Di daxuyaniyê de hate gotin ku bûyera li gundê Sufiya ya herêma Rajab a Bexdayê qewimiye, ji aliyê kesên ku cil û bergên leşkerên iraqî li xwe kirine ve hatiye kirin û di encamê de 25 kes hatine kuştin. **BEXDA**

## Li Mûsilê 23 girtî reviyan

Li gorî agahiyan, ji bajarê Mûsilê ku herî zêde bûyerên bişîdet rûdidin, 23 girtî ji girtîgehê reviyane. Rayedarên polîsan ragihand ku girtiyên li girtîgeha Gazlanî ya li Mûsilê, dîwar kun kirine û reviyane. Heta saetên nîvroyê jî, hêşedarên zîndanê bi vê yekê nehesiyane. Rayedaran dan diyar kirin ku wan agahî daye hemû xalên çavdêriyê ên bajêr yên di destê yekineyên artêş û polîsan de ye. Li gorî daxuyaniya rayedaran,di nava girtiyan de milîtanên El-Qayîde û gelek girtiyên din yên girîng hene. **MÛSIL**

# Heskîfê nexeniqînin!

**Piştgiriya ji bo rizgarkirina Heskîfê ji gelek aliyan ve geş û gur dibe. Piştgiriyeke mezin jî Komaleya Xwezahî ji qada sanal ve hate dayîn û 60 hezar nameyên elektronîk ji Erdogan re şandin. Daxwaza nameyan ev e ku dîroka Heskîfê bi lêkirina bendavê neye xeniqandin**



Di çarçoveya kampanyaya ji aliyê Komeleya Xwezayê (Doğa) ve hatiye destpêkirin de, da ku xebatên çêkirina Bendava Ilisuyê bêne rawestandin û UNESCO Heskîfê wekî mîrateyeke cîhanê qebûl bike, ji serokwezîrê Tirkiyeyê, Recep Tayyip Erdogan re 60 hezar nameyên elektronîk hatin şandin.

Kesayetên navdar ên wekî Yaşar Kemal, Orhan Pamuk, Sezen Aksu û hunermend Tarkan jî piştgiriyê didine vê kampanyayê.

Serokê Desteya Rêveber a Komeleya Xwezayê (Doğa) Guven Ekenê diyar kir "kampanyaya şandina bîrnameyên elektronîk par dest pê kiribû û hejmara kesên piştgirî dane kampanyayê ji 60 hezar kesan derbas kiriye. Bi vê projeyê em gihiştin armanca xwe ya destpêkê. Armanca me ya sereke ew e ku dewletên Ewropayê ji projeyê vekişin, bi vî awayî biyaniyan alîkariya fînansê bi şûn de kişandine. Lê heta ku projeya Bendava Ilisuyê ranewestînin, Dê ev kampanya berdewam be. Me bîrnameyên elektronîk ên ku daxwazên me didin der, şandine em li benda bersivê ne."

Eken destnîşan kir, ku Heskîf ji bo ku bikaribe têbikeve nava lîsteya "Mîrateyên Cîhanê ya UNESCO'yê", ji 10 pîvanên sereke 9'an pêk tîne û wiha berdewam kir.

Pîramîdên Misirê ji 10 pîvanan bi tenê xwedî 4 ji wan dihewîne, lê Heskîf xwedî 9 pîvanan e, lê hîn jî hewldaneke wisa nîn e." Her wiha Eken got: "Ji bo 'rizgarkirina' Heskîfê û xistina wê ya nava lîsteya 'Mîrateyên Cîhanê ya UNESCO'yê', ew ê di 11'ê nîsanê de konferanseke ku 2 rojan berdewam be li dar bixin." **STENBOL**



Bûrhan Erdem

burhanerdem@hotmail.com

## Fransa û Almanya dê Tirkiyeyê biêşînin

Yekitiya Ewropa di demekê de ku bi tunebûna lîderekî xwe re û ji ber krîza aboriyê li nava xwe şikestineke xedar a salên dawî dijî, ji Tirkiyeyê re li çareyan digere. Çare jî ne wekî berê dihate gotin, ne reform, ne maf û ne jî demokratîzekirin e. Ewropa ji Tirkiyeyê re çareya wisarawestînê pêşkeş dike. Yanî tu wekî xwe û ez wekî xwe, em ê wisa bimînin û pevre hevaltiyê bimeşînin. Û di ser de wekî diyarî jî em ê li kurdan bidin, li nava xwe wan nehewînin. Tabî yên vê yekê dibêjin jî, ew dewletên mezin ên Yekitiya Ewropayê, Fransa û Almanya ne.

Encama gera Şansolyeya Almanyayê Angela Merkel ev yeka hanê bû. Tam tiştê ku rayedarên Tirk dixwestin, di hemû axaftinên wê de gotinên Merkel bûn. Wan jê re behsa dibistanên Tirkiyên li Almanyayê dijîn dikirin. Merkel digot çima nebe û soza destûra ji bo dibistanan da. Tirkan gazin ji vîzeyê dikirin, Merkelê soza başkirinan da. Îmzekirina peymanên aborî, hevkariya leşkerî û hwd. Merkel ji bûyina lîdera Yekitiya Ewropayê dûr, li gorî berjewendiyên xwe yên aborî û li gorî dilê Tirkiyeyê tevgeriya. Tabî armanc jî ew bû ku perspektîfa endamtiya esasî ya Yekitiya Ewropayê ji bo Tirkiyeyê ji holê rake. Şêwirmendê wê jî ji BDP`yîyan dipirsî; ka gelo ola kurdan çiye. Ji şehîdên çapemeniya me Bûrhan Karadenîzê rehmetî ku zarokê bajêr bû; ji rewşên wisa re xeberên wî yên xweş hebûn ku ez niha wî bi vê wesîleyê bibîr tînim.

Berê ji bo Tirkiyeyê di programên Yekitiya Ewropayê de dihate gotin ku ew dê gavên Enqereyê, yê ku di çarçoveya 'Krîterên Kopenhagê' de biavêje, dê were destek kirin. Lewra daxwaza tevlîkirina Tirkiyeyê ya yekitiyê serdest bû. Ji bo avêtina gavên demokratîk dihate teşwîkkirin. Niha ji bo neavêtina van gavan rayerdarên ewropî çi ji destên wan tê dikin. Ev yeka hanê, di dema daxuyaniya îlankirina çûyina Merkelê ya Tirkiyeyê de derketibû pêş. Ji bo Tirkiyeyê dihate gotin ku ew ji bo demokratîzebûnê gavan diavêje û ev yek dihate teqdîrkirin.

Heman tişt di dema îlankirina çûyina Fransayê ya Serokwezêrê Tirk R. T. Erdogan de jî hate gotin. Ya rastî me ji wê daxuyaniya Fransayê, wekî tişta herî li pêş, kirinên wê yên li dijî Tevgera Azadiya Kurd kire nûçe. Ku di daxuyaniyê de dihate gotin; ew ê bînin bîra serokwezîr ku Fransa PKK'ê wekî terorîst dibîne û ew jî xwediyê operasyonên li dijî PKK'ê ne. Lê ji vê zêdetir tiştek heye ku li ser endamtiya Tirkiyeyê ya Yekitiya Ewropayê tiştek nehatiye gotin. Di nava hevokan de jî, mirov dixwîne ku êdî ji Tirkiyeyê re vekirî dibêjin; endamtiyê ji bîr bike. Tirkiye jî ji vê yekê re qayil e.

Lewra niha muzakere tên kirin ku vana hevdîtinên endamtiyê ne. Lê xalên girîng ên ku reforman dixwazin nayên muzakerekirin. Di van rojan de pesindayina guherîna qanûnan, di devên ewropiyan de ye, êdî kesek nabêje; divê hikûmeta AKP'ê pêvajoyeke reformên bêtir bixe jiyanê. Ev reformên han jî di çarçoveya hurmeta ji bo mafê mirovan, demokrasî û azadiyê de hatibûn formulekirin. Lê vana bi qasî çareseriya pirsgirêka Qibrisê, ji Tirkiyeyê re nabin şert. Bi operasyonên li dijî siyasetmedarên kurd û terorîzekirina civaka kurd a li Ewropayê niha dilê Tirkiyeyê xweş dikin. Lê ew ê Tirkiyeyê gelekî biêşînin jî û ew ê di demek kin de be jî. Hefteya pêşiya me em ê encama gera Şansolye Merkel û çûyina Fransayê ya Erdogan bibînin.

## NATO'yê 6 leşkerên Afganistanê kuştin

Li herêma Kunduz a Afganistanê 6 leşkeren afganî ji aliyê leşkerên Almanyayê qaşo dost ve hatin kuştin. Li ser mijarê rayedarên leşkerî yê NATO û Afganistanê daxwuyanî dan. Hat gotin ku êvara şemiyê li Kunduzê 6 leşekerên afganî bi xeletî hatine kuştin. General Mihemed Zahîr Azîmî destnîşan kir ku gelek leşkerên Afganî jî birîndar bûne.

Li heman herêmê demek beriya vê 3 leşkerên alman ji aliyê mîlîtanên Talîbanê ve hatibûn kuştin. Gumana me têkiliya her du bûyeran bi heve hebe. Leşkerên Almanyayê dema li başûrrojavayê Kunduzê mayinan paqij dikir şer diqewime û di vê şerê de hatne kuştin.

Her wiha NATO'yê daxuyaniyeke din da û da zanîn li başûrê Afganistanê teqîn pêk hatiye û leşkerekî wan hatiye kuştin. Lê nasname û nijada leşker nehat aşkerakirin. **QABÎL**

## 'Îran naye rawestandin!'



Serokomarê Îranê Mehmûd Ehmedînejad got ku zextên navneteweyî ya li ser Îranê çiqas zêde dibe Îran jî biryardariya xwe xurtir dike.

Ehmedînejad li Sîrcana Îranê axivî. Di axaftinê de diyar kir ku ew ne bawer e zextên navneteweyî biryardariya neteweya Îranê ya ji bo projeya nukleerî rawestîne û got: "Hun karin bi her awayî hewldan bikin, daxuyaniyan biweşînin, biryaran bigirin lê çiqas birûskên we li hemberî me tûj lêde her wiha biryardariya me ya ji bo mijarê jî zexim dibe."

Ehmedînejad vegot ku welatên Rojava di Konseya Ewlehiya NY'ê de dixwazin li dij Îranê biryarên ambargoyên din jî bidin girtin. Li gor Ehmedînejad serê vê jî DYA, Israîl û Evropa dikişîne. Dixwazin pêşî li projeya dewlemendkirina uranyumê bigire. Ehmedînejad destnîşan dike ku fikara vana ew e ku dê Îran çeka nukleerî çêke. Di axaftinê de vegot ku ew dixwazin hilberîna enerjiya nukleerî bikin û ji bo armancên aştiyanê bikar bînin.

Ehmedînejad got welatên navborî nukleera xwe îmha bikin û da ku cîhan ji xetereya nukleeran rizgar bibe. Serokdewletê Amerîkayê duh bi daxuyaniyek aşkera kiribû ku ew dê zext li Îranê bike da ku pêşî li nukleeriya Îranê bigirin. Ji bo vê jî hewl didin piştgiriya navneteweyî derxin asta herî jor.

Ehmedînejad li ser vê jî aşkera kir ku Obama bi şiyara guherînê hat. wan wî bi erênî pêşwazî kiribûn. Lê di nav demê de derket holê ku tu cihêtiya wî û ên din nîn e. Zext didomin. Polîtîkayên Afganistan û Iraqê hê wek xwe ye. Tehran bo ku zextê navneteweyî kêm bike Sermuzekerevanê Îranê yê Nukleerê Saîd Jalîlî şandibû Çînê. Îran Çînê wek tifaqa xwe ya stratejîk ya aboriyê dibîne. Di vê serdanê de xwest piştgiriya Çînê ya ji bo projeya xwe ya nukleerî xurt bike. Wezîrê Karen Derve yê Îranê Manuşehr Muttaki jî bo ku di Koneseya Ewlehiyê de destek bidin wan derket rêzeserdanê. Rêzeserdan jî ji Gabonê dest pê kir.

Roja 12'ê Nîsanê Washingtonê ji bo nûkleerê di Konseya Ewlehiyê de hevdîtinek navneteweyî pêk tê û di vê hevdîtinê de Serokwezîrê Tirk Erdogan jî biryara xwe guhert û got: "Ew dê biçe civînê." Her wiha Serokdewletê Çînê jî diyar kiribû ku dê biçe civîna mijara gotinê û bi van biryaran Obama bextewariya xwe anîbû ziman. **TEHRAN**

## Bazara ristina 'tevna reş'!

Berya serdana Serokwezîrê Tirkiyeyê Erdogan ya Parîsê Wezareta Karên Derve ya Fransayê got ku ew hewl didin li dij PKK'ê bi Tirkiyeyê re hevkariyê bikin.

Li ser mijarê Sefareta Fransa ya Enqereyê jî daxuyaniyek nivîskî weşand. Di daxuyaniya sefaretxaneyê de tê gotin ku Erdogan roja 7'ê nîsanê tê serdana Fransayê.

Ev daxuyanî di çapameniya Tirkiyeyê de jî cih girt. Tê diyarkirin ku Fransa hewl dide hevkariya bi Tirkiyeyê re heye berfire bike. Her wiha di nav hevdîtinan de dê hevkariya li dij PKK'ê jî biggrin dest û endamtiya Tirkiyeyê ya Yekitiya Ewropayê (YE) jî dê bê nirxandin.

Li Fransayê li dij polîtîkayên Sarkozy ên berjewendîperest bertekên gel zêde dibin. Herî dawî di hilbijartinên 14 û 22'ê adarê yên Konseyên Heremî de Fransiyan ji ber van polîtîkayan derseke mezin dan Sarkozy. Di anketan de rêjeyeke mezin jî gel fransayê hew Sarkozy wek serokomar dixwazin. Erdogan herî dawî di tîrmeha 2008'an de çûbû Parîsê û beşdarî civîna bilind ya ji bo Yekîtiya Derya Spî bûbû. **PARÎS**

www.arsivakurdi.org

# 4'ê Nîsanê pîroz kirin

**Koordînasyona Koma Jinên Bilind bi daxuyaniyekê rojbûna Rêberê PKK'ê pîroz kir û daxuyand ku ew ê îsal bi her awayî azadiya Rêberê xwe bikin bingeha xebat û têkoşîna xwe**



Koordînasyona Tevgera Jinan KJB'ê, rojbûna Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a 61'emîn pîroz kir. KJB'ê bi boneya 4'ê Nîsanê rojbûna Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Roja rojbûna me 4'ê Nîsanê ku weke rojeke ji dîroka me ya ku ji aliyê serdestan ve hatibû tunekirin, derketiye û bi taybetî jî me jinan xistiye nava lêgerîna rastiya xwe û zindî kiriye di serî de ji Serokatiya me û gelê me û ji hemû mirovahiyê re pîroz be."

KJB'ê di berdewama daxuyaniyê de bal kişand li ser girîngiya Rêberê PKK'ê Ocalan a ji bo jinan û wiha got: "Di dîroka mirovahiyê de, mirovbûn, gelbûn û civakbûn hemû bi rojbûnên mezin pêk hatine. Rojbûnên bi vî rengî, mirovan ji zindiyên din cuda kiriye û civakbûn bi pêş xistiye. Rojbûna biyolojîk bi tena serê xwe mirovbûnê pêk nayne. Her wiha mirinên biyolojîk jî mirinên rastî nîn in û ev yek ji aliyê dîroka mirovahiyê ve gelek caran hatiye îspatkirin. Rojbûna biyolojîk û hebûn bi tercîh û îradeya mirovan pêk nayê. Lê rojbûnên rastî, hebûna şexsiyetê, weke pêwîstiya mirovbûnê ji ber ku îradeya azad, ramana azad bi awayeke zanebûn bi pêş dixe ji bo xwe mirovbûnê û civakbûnê esas digire. Şexs dema ku rojbûna xwe bi civak û mirovahiyê re dike yek wê demê bi xwe jî dibe mirov. Dîroka mirovahiyê pir bi êş be jî dîroka mirovên ku bi rojbûna xwe re rojbûna gelan, neteweyan û mirovahiyê ye. Ev mirov êdî ji şexsekî derbas bûne û bi dîrok, gel û mirovahiyê re bûne yek. Serok Apo di şexsê xwe de bi rojbûnên mezin ku afirandiye ve gelê kurd jî ji nû ve zindî kir û can dayê. Rojbûna Serok Apo ji bo me jinan û gelê kurd, rojbûneke bi vî rengî ye. Ji ber vê yekê îro bi milyonan kes dibêjin 'rojbûna Serok Apo rojbûna me ye, rojbûna jinan e û rojbûna gelê kurd e' û bi vî rengî rojbûna xwe pîroz dike."

**Dê ji bo êrîşan bibe bersiv**

KJB'ê daxuyand ku ew encamên vê rojbûnê di warê îdeolojî, felsefe û jiyanê de di vejîna gelê kurd de dibînin. Her wiha KJB'ê bal kişand ser êrîşên dewletên Tirkiye, Îran, Sûriye û Ewropayê, yên li dijî gelê kurd û wiha got: "Pîrozkirina 4'ê Nîsanê bi çalakiyên girseyî dê ji bo van êrîşan bibe peyameke xurt. Her wiha ji bo ku Serokatiya me di demeke kin de azad bibe jî dê bibe îfade û peyamek girîng." Di berdewama daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Em şehîdên Amarayê rêheval Mahsum û Mustafa bibîr tînin û ji bo bîranîna van hevalan bi ruheke berxwedar hemû jinan û gelê xwe ji bo çûyînan Amarayê vedixwînin. Em bawer didikn ku gelê me dê vê rojê li gorî ruhê meşa Amareyê û ruhê berxwedêr ên şehîdan pêşwazî bikin."

**'Em ê bikin sala azadiyê'**

KJB'ê di dawiya daxuyaniyê de jî wiha got: "Em ê bi biryarbûna ku rojbûna Serokatiya me rojbûna me ye, azadiya wî azadiya me ye 2010'an bikin sala azadiya Rêber Apo. Ji ber vê baweriyê jî em ê azadî û muxatabûna Serokatiya xwe ya di çaraserkirina pirsgirêka kurd de bikin bingeha hemû xebat û têkoşîna xwe. Divê em di meşa Amara û pîrozbahiyên 4'ê Nîsanê de vê yekê bi her awayî nîşanî hemû cîhanê bidin. Em carake din rojbûna gelê xwe pîroz dikin û îdia û biryarbûna xwe ya ji bo azadiyê dubare dikin." (BEHDÎNAN / ANF)



**Mizgîn Ronak**

## Embera

Dem li dora serê me dizivire, wek kuliyên berfên çiyayî. Dem dizivire Embera, bi kuliyên berfê re, em jî pê re. Carna em dibin perperok dizivirin, li dora agir; agirê ku di heman demê de, dem e jî. Em dizivirin, dem dizivire Embera, didome ev reqsa xwedawendî. Didome û hezar car mirin, hezar car jiyan tîne her êvar. Her êvar em, dimirin Embera, hezar car. Dilê me yê ji kokên darên şewitî û çîroka kerengan ji hezar mirinê derbas dibe, ji hezar jiyanê xatir dixwaze. Dibe sibe govend e, dibe êvar govend e. Lê tev jî li mirinê diqedin, li ber deriyê wê qesra qirîstalî…

Min 40 roj berê nameyek din jî nivîsîbû ji te re, Embera. Li benda bersiva te mam, li benda bêdengiya te. Ku bersiva te bihata, ez ê bi bayê bezê biçûma gel hevalê Metîn, min ê bigota: "heval, heval! Ji Emberaya te name hat!" Tu dizanî, Metîn evîna te ya herî kevn e, hevalê te yê herî kevin, hevserê te yê delal. Birîna dilê te yê ji agir…

Niha jî tu birînek xedar î li canê wî, nabêje zêde, lê tu xezalek ji birînayî, li dilê wî…

Paşê me yê mihrîcanek li dar bixista, mihrîcana Emberayê; tu yê bi bêhna misk û emberê bihatayî lê paşê…

Min bihîst ku te nameya min negirtiye. Min pirsî jî, bersiv tunebû… Belkî jî ew nama min di xewnek ji mirinê de firiya û çû. Bû çivîkek delodîn, ji bo ku ji ber me ve jî bifire çû dûrahiyan… Xerîbî; ew dema nas, ew dema ji mija dûrahiyan, ew dema ji kesera pelên çilo…

Vê nameyê ji te re ji mirinê dinivîsinim, ji welatê mirinê. Lewre tu jî wek bi hezaran keç û xortên xweşik çûyî jiyanê, em li vê dinê man, li warê mirinê. Ku niha wiha bi destên xwe yên ji bêriyê dinivîsînim, bi dilê xwe yê ji xweliyê… Dizanim ku çi bêjim têr nake, herim ku nabînim. Dizanim, ev name çirûskek ji agir e, ji vê keviya heyatê. Berê nivîskara xwe dişewitîne, paşê ji xwe.

Dibêjin ku tu, di havîna 1994'an de şehîd ketiyî, li Amedê. Hêzên faşîst hatine te girtine, xwestine ku te bibin işkenceyê û dû re bavêjin zindanê.

Lê tu, bûyî çivîkek û firiyayî ji nav lepên wan, çûyî û hey çûyî! Ew roj ev roj e bêdeng î, çem xwe diherikîne ba te. Hezkiriyên te dilopên wî çemî ne. Ew roj, ev roj e ku ew çem diherike. Em destên xwe yên ji stranên şikestî, dirêjî baxçeyê te dikin. Hespek şîn bêriyên me ji xwe re dike bask û diçe çîrokên welatê xewnê.

Dilê min bidawî nebû, lê name li vira bi dawî dibe. Li dilê te silav Embera, li çûyîna te, li jinaniya te ya asîmanî…

Bi xatêrê destên te yên ji gulan…

(Embera Yaşa ya ji gundê Tepecûgê, di havîna 1994'an de, dema ku polîs davêjin ser mala wan, xwe ji qata çaran davêje û jiyana xwe ji dest dide.)

## Rêxistinbûneke serbixwe

Delal EREN/ STENBOL / ANF

Ji damezrînerên Kolektîfa Femînîst a Sosyalîst Hulya Osmanoglu diyar kir ku ji bo ku derkevin derveyî sîstema desthilatdar a zilaman perspektîfeke femînîst a sosyalîst pêwîst e.

Kolektîfa Femînist a Sosyalîst ku hedefa wan hemû femînîst di rêxistineke de bên cem hev hatiye damezirandin ji 2008'an heta niha rêbazên siyaseta serbixwe ya ji dewlet, sermeya û zilaman pêş dixe.

Ji damezrînerên kolektîfê Hulya Osmanoglu der barê armanc, hedef û rêbazên xebatên xwe de agahî dan. Osmanoglu wiha got: "Em ji perspektîfeke femînist derketin rê. Em xwe parçeyeke tevgera femînîst dibînin. Ango em bi her awayî pê li zemîneke femînst dikin û xwe weke femînîstên sosyalîst bi nav dikin. Têkoşîna me li dijî sîstema desthilatdar a zilaman e."

Osmanoglu got ku bindestiya jinan ji malê dest pe dike û wiha berdewam kir: "Berjewendiyên zilaman di bindestiya jinan de ye. Jibilî vê yekê tifaqa desthilatdariya zilaman bi kapîtalîzmê ve jî şertên xebatên jinan ên li derveyî malê diyar dike. Jinan bi heqdesteke kêm didin xebitandin. Îstîhdam jî bi awayeke zayendparêz pêk tê. Ji ber vê yekê jî em di wê baweriyê de ne ku têkoşîna rizgariya jinan divê ji zilam, sermaye û dewletê serbixwe pêk bê."

Osmanoglu got ku di nava rêxistina wan de ji çînên cuda jin hene. Her wiha jinên zewicî, yên nezewicî, mezin, ciwan, karker, betal hene. Lê tişta ku wan tîne ba hev baweriya pêwîstiya têkoşîna femînîst a sosyalîst e.

Osmanoglu got ku ew bi navê "Polîtîkaya Femînist" kovareke jî derdixin. Bi vî rengî dibin dengê têkoşînê û li vir nîqaşên xwe bi pêş dixin. Her wiha kovar heta niha 5 hejmar derketiye û amadekariya hejmara 6'emîn dikin.

Osmanoglu diyar kir ku têkîliyên wan bi rêxistinên din ên jinan re jî heye û yek ji van jî tevgera jinên kurd e. Ew ji salên 90'î heta niha gelek caran hatine ba hev û piştgirî dane hev. Her wiha niha jî di bin banê Hewldana Jinan a Ji Bo Aştiyê re bi jinên kurd re tên ba hev û polîtîkayên aştiyeke çawa dixwazin bi pêş dixin.

## Bi semînerê rêbazên parastina jinê vegotin

Navenda Alîkarî û Şêwirmendiya Jinan a Nujiyan a di bin banê Şaredariya Bismilê de xebatên xwe dimeşîne, ji bo parastina jinan "Semînera Hiqûqê" da.

Navenda Alîkarî û Şêwirmendiya Jinan a Nujiyan a di bin bana Şaredariya Bismilê de xebatên dimeşîne, ji bo jinên rastî şîdetê tên, têkildarî qanûna hêjmar 4320 an parastina malbatê "Semînera Hiqûqê" da. Di semînera ku li Navenda Jinan pêk hat de Cîgira Şaredariya Ayşe Avşar û gelekî kes amade bûn. Parêzer Sila Talay, der barê zagona hejmar 4322'an de jin agahdar kirin û diyar kir ku gelek jinên rastî şîdetê tên, an serî li Midûriyeta Polîsan didin an jî serî li Navenda Jinan a Şaredariyê didin. Talay, bi bîr xist ku li Amedê Navenda Şêwirmendî û Piştgiriya Hiqûqî ya Jinan a ji 6 parêzeran pêk tê heye û wiha got: "Em li vir ji bo pirsgirêkên jinan ên hiqûqî serlêdanan digrin. Jinên rastî şîdetê tên divê teqez serî li me bidin."



Talay, der barê qanûna ku pêşî li şîdeta lihemberî jinan digirin de agahî dan û xwest ku jinên rastî şîdetê tên serî li wan bidin. Piştî axaftinan neynikên ku telefona Navenda Şêwirmendî û Piştgiriya Hiqûqî ya Jinan li ser heye li jinan hate belavkirin. AMED

## Bersûc hate girtin

Li Merignaca bi ser bajarê Bordeauxya Fransayê zilamê bi navê Ahmet Çelîk (47) ku wekî bersûcê qetilkirina jineke kurd dihat dîtin hate girtin. Jina bi navê Hamdiye Mustafa Pirmuz saleke winda bûbû û jê agahî nedihat girtin. Cenazeyê wê di 16'ê mijdara 2009'an de li daristana Merignacê hatibû dîtin.

Der barê qetilkirina Hamdiye Mustafa Pirmuz de delîlên şênber tam nehatibin dîtin jî polîsên Fransayê Ahmet Çelîk girt. Ji ber ku cenaze hatibû parçekirin delîl bi zorê tên berhevkirin.

Hate hînbûn ku Ahmet Çelîk sûc qebûl nekiriye. Lê der barê wî de gumanên zêde hebûne û ji ber vê yekê jî ji aliyê dozgerê ku lêpirsînê didomîne ve hatiye girtin. PARÎS

www.arsivakurdi.org

# AKP rêbazên qirêj bi kar tîne

SEMÎHA ALANKUŞ



Li Tirkiyeyê piştî operasyonên Ergenekonê dîsa navê Gladioyê hate rojevê. Gelek nîqaş li ser vê rêxistina şerê taybet û şerê psîkolojîk hate kirin. Ev nîqaş hê jî di rojevê de ne. Di nîqaşan de pirsa gelo Tirkiye dikare Gladioya di nava xwe de ango Ergenekonê deşîfre bike û sûcên ku vê rêxistinê kiriye bidarîzîne?

Ev nîqaş dihêlin ku em careke din li ser şerê taybet ên ku li hemberî gelan an jî muxalîfên li dijî desthilatdariyê ji aliyê rêxistinên taybet ve tên kirin li ber çavan derbas bikin. Gelo ev rêxistin kengî, ji bo çi hatine avakirin, armanca wan çi ye, kîjan rêbazan bi kar tînin? Divê em di vê pêvajoya ku li Tirkiyeyê li ser pirsgirêka kurd nîqaş tên kirin û riyên çareseriyê tên nîqaşkirin carake din li ber çavan re derbas bikin. Bi taybetî şerê qirêj a psîkolojîk ku li hemberî gel tê meşandin bigirin dest. Ji ber ku ev şerê ku bi riyên rêxistinên taybet tê meşandin herî zêde gelê kurd dike hedef. Weke riya herî esasî ya tasfiyekirina têkoşîna gelê kurd tê bipêşxistin.

**Gladio an jî şûr…**

Belê weke ku tê zanîn ev rêxistina ku zêdetir bi navê Gladioyê (Ev navê îtalyanî tê wateya Şûr) tê naskirin piştî Duyemîn Şerê Cîhanê hate avakirin. Li hemberî "xetereya komunîzmê" ji aliyê NATO'yê ve, di 1952'yan de hate damezirandin. Ji bo vê rêxistinê cara ewil li Sardunyayê kampa perwerdehiyê hate ava kirin. Li bakurê Îtalyayê li 139 deveran depoyên çek û muhîmatê hatin çêkirin.

> Hikûmeta AKP'ê ku li Kurdistanê bi her awayî rewabûna xwe winda kiriye û serî li rêbazên qirêj dide û bi riya çapemeniya xwe ya alîgir şerekî qirêj a psîkolojîk dimeşîne, agahiyên derew belav dike

**Li her welatî cuda ye**

Lê ev rêxistin, bêhtir bi navê Gladioyê bê zanîn jî li gelek welatan bi navên cuda xwe birêxistin kir. Li Yewnanistanê B-8'an jî Sheep Skin (çermê mihan), li Belçîkayê SDRA-8, li Holandayê NATO Command, li Almanyaya Rojava Rêxistina Gehlen, Awusturyayê Schwert, li Fransayê Gula Ba, li Îspanyayê Koma Rizkarkirina Antî Terorê (GAL), li Îngilistanê jî bi navê Scret British Network rêxistin hatin avakirin.

**Deşîfre nakin**

Li Tirkiyeyê wekî ku tê zanîn bi doza Ergenekonê nîqaşên Gladioyê hatin rojevê. Lê her diçe ev yek zelal dibe ku Tirkiye li şuna ku vê rêxistinê bi her awayî deşîfre bike û bi taybetî jî sûcên ku van kesên ergenekonî li Kurdistanê kirine zelal bike û bidarizîne behtir xwe ji nûve dizayn dike. Kesên ku deşîfre bûne digire û di bin navê civak demokratîk dibe an jî ber bi demokratîkbûnê gav tên avêtin, civakê dixapîne. Civakê bi vî rengî manipule dike. Lê ya rast ev e ku niyeta dewletê bi taybetî jî niyeta Hikûmeta APK'ê tuneye ku sûcên li dijî kurdan aşkere bike. Ev yek gotinên avakarê Gladioya Îtalyayê Cossiga de bi aweyeke zelal tê fêm kirin. Cossiga di hevpevyîneke xwe de der barê Gladioya Tirkiyeyê de wiha gotibû: "Li Tirkiyeyê rêxistineke weke Gladioyê hatibû damizirandin. Lê ev rêxistin dûrî rêxistinên ku li Ewropayê hatibûn avakirin bû. Tirkiyeyê di nava komîteya siyasî de cih nedigirt. Di komîteya koordinasyonê de bû. Ango serbixwe bû."

Cossiga di hevpeyvînê de li ser pirsa "di Gladioya Tirkiyeyê de kê/î cih digirt de" jî bersiveke wiha dide: "Min qet hevdîtin bi endamên Gladioya Tirkiyeyê re pêk neanî. Lê ez vê yekê dizanim ku her tim rewşeke Tirkiyeyê ya taybet hebû."

Ev gotinên Cossiga jî nîşan dide ku hêzên tarî yên navteweyî naxwazin hê jî Gladioya Tirkiyeyê deşîfre bikin. Tenê hin kesên ku bi awayeke deşîfre bûne an jî pêywira ku ji bo wan hatiye dayîn baş bi cih neanîne digirin an jî deşîfre dikin. Ya herî girîng jî sûcên wan ên li hemberî kurdan kirine deşîfre nakin.

Rêbazên wan ên şerê taybet, qatlîamên li Kurdistanê ji raya giştî re aşkera nakin. Bi israr van tiştan vedişêrin. Tenê aliyên wan ên qaşo li hemberî hikûmetan planên darbeyan kirine, an jî planên sûîqastan kirine tinîn rojevê. Lê dema ku vê yekê dikin jî dîsa mejiyê civakê tevlihev dikin. Agahiyên rast û zelal nadin. Bi riya çapemeniyê aloziya agahiyan belav dikin.

**Tirsê belav dikin**

Belê rêbazên şerê taybet ya herî zelal di nava civakê de belavkirina tirsê ye. Bi tehdît, kuştin, revandina mirovan di nava civakê de tirsê belav dikin. Bi vî rengî zemîna xwerêxistinkirinê diafirînin. Ev aliyê ku tê zanîn e.

Lê rêbaza herî zêde tê bikaranîn jî şerê psîkolojîk e. Vê yekê jî bi taybetî bi riya çapemeniyê dikin. Hemû kirin û tirsa ku diafirînin an jî dixwazin biafirînin bi riya çapemeniyê dikin.

Dewleta Tirk bi taybetî jî di salên dawî de Hikûmeta AKP'ê vê rêbazê ango şerê psîkolojîk li hemberî gelê kurd bi her awayî bi kar tîne. Dîsa Artêşa Tirk vê rêbazê bi kar tîne. Bi vî rengî dixwazin baweriya ji bo serkeftinê bişîkinin. Beriya demeke Serfermandarê Artêşa Tirk îlker Başbug ev yek bi awayeke zelal anîbû ziman. Gotina wî ya "em ê hêviyên serkeftinê bişikênin" ji bo vê yekê bû. Ji ber ku ew jî baş dizanin li hemberî têkoşîna gelê kurd ew bi rêbazên leşkerî, bi şerê leşkerî nikarin bi serkevin. Ji ber vê yekê jî giraniyê didin şerê psîkolojîk. Ji bo vê yekê jî rol û mîsyoneke girîng û taybet didin çapemeniyê.

**Hilbijartinên herêmî**

Hikûmeta AKP'ê jî vê rêbazê bi kar tîne. Ji bo ku pêşî li têkoşîna gel bigire û tasfiye bike çi rêbazên qirêj hene bi kar tîne. Der barê kesên ku di nava têkoşînê de cih digire agahiyên qirêj belav dike. Ji bo vê yekê tenê em rêbazên ku dema hilbijartinên herêmî ya 29'ê Adara 2009'an bînin bîra xwe şerê psîkolojîk a ku AKP li hemberî gel û xebatkar û kadroyên têkoşînê de dê baştir bên fêmkirin. Talîmata ku AKP'ê ji bo rêxistinên xwe şandibû bi esasî ferman û talîmatnameya şerê qirêj û şerê psîkolojîk bû. AKP'ê wiha gotibû: "Divê cudatiya di navbera kurmanc û zazayan de derkeve pêş, li ser vê yekê propaganda bê kirin. Hêzên demokratîk ên Tirkiyeyê jî bo ku xwe nêzî DTP'ê nekin divê DTP weke partiyeke marjînal û bi pirsgirêkên gel re eleqadar nabe bê nîşandan. Der barê namzetên DTP'ê de agahiyên qirêj divê bên belavkirin." Ev xal tenê çend xalên ji talîmata AKP'ê bû. Gelek tiştên din hebûn. AKP'ê li ser vê esasê li Kurdistanê proganda kir. Xwest baweriya gel bişikîne û mejiyê gel tevlihev bike. Bi taybetî jî baweriya gel li hemberî kardo û namzetên ku hatine diyarkirin bişikîne.

Di vê derê de pirsa gelo çima ev rêbaz tên bikar anîn careke din derdikeve pêşberî mirovan. Ev yek zelal e ku dema ku hêzek rewabûna xwe winda bike serî li van rêbazan dide. Ji ber ku teybetiyeke wisa ya şeran heye. Dema ku partiyek an jî hêzeke leşkerî vê rewabûnê winda bikin û êdî nikaribin gel bixapînin an jî xwe bidin jiyankirin hemû riyên qirêj dixin dewreyê. Bi vî rengî dixwazin xwe careke din dizayn bikin û hebûna xwe bidomîn.

Tişta AKP dike jî ev e. Bi taybetî piştî ku di hilbijartinên herêmî de gelê kurd îradeya xwe nîşan da ev yek zêditir bû. Li ser siyasetmedar, şaredar, kadro û xebatkarên kurdan gelek agahiyên ku di nava civakê de bêbaweriyê bi pêş bixe, belav kir. Qaşo di bin navê guhdarkirina telafonan an jî guhdarkirina avahiyan de "delîlên suc" bi dest xistine giranî da rêbazên qirêj. Ji qaşo darizîna şaredaran heta hin axaftinên telefonan di çapemeniya xwe ya dîtbarî û nivîskî de weşand.

**Dixwaze bêbaweriyê ava bike**

Lê ji ber ku heta niha tiştekî şenber di destên wan de tuneye bi hezaran kes ev nêzî saleke ye di girtîgehan de bêyî darizandin têne rawestandin. Her wiha der barê van kesan de îdianame jî hêj nehatiye amadekirin. Ev kes jî ber çi li girtîgehan tên rawestandin ne diyar e. Hemû pîvanên hiqûqa gerdunî di vî warî de hatiye binpêkirin. Bi her awayî şerekî qirêj î Sîstematîk tê meşandin. Tenê hin agahiyên qirêj ku civak li hemberî kadroyan bertekan nîşan bide di çapemeniya xwe de an jî bi riyên cuda belav dikin.

Hikûmeta AKP'ê ku li Kurdistanê bi her awayî rewabûna xwe winda kiriye û serî li rêbazên qirêj dide niha dîsa amadekariya şereke qirêj a psîkolojîk dike. Amadekariyên xwe dike û dixwaze der barê kesên ku li girtîgehan têne girtin agahiyên derew biweşîne û belav bike. Bi vî rengî dixwaze peyamê bide gel û bibêje "binêrin kadro, xebatkar û siyasetmedarên we wiha ne." Bi vî rengî civakê manuple bike û bigîhîjê armanca xwe.



# Ji bo hunermendê nexweş şeva pişteva




## Ji bo hunermendê nexweş Salîh Dalgin, li Salona Dawetê ya Kaplanê bernameya piştevaniyê hate lidarxistin. Di şahiyê de Şaredar Osman Baydemîr axivî û got ku divê xwedî li hunermendan derbikevin

Komeleya Hunermendan a Farqînê bi wesîleya ku piştgiriyê bidin hunermend Salîh Dalgin ku bi nexweşiya pençeşêrê ketiye şahiyek lidarxistin. Şahî bi tevlibûna gelek kesî li Salona Dawetê ya Kaplanê pêk hat.

Li Salona Dawetê ya Kaplanê, bi armanca ku piştgiriyê bidin hunermedê nexweş Salîh Dalgin, şahiyek hate lidarxistin. Şahî ji aliyê Komeleya Hunermendan a Farqînê ve hate organîzekirin. Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr, Cigira Meclîsa Giştî ya Amedê Semra Azîzoglu, Serokê Odeya Bazirganiyê ya Amedê Galîp Ensarîoglu û gelek nûnerên civaka sîvîl beşdarî bernameyê bûn.

Di bernameyê de sînevîyozneke ku jiyana Salîh Dalgin vedi-



got hate nîşandan. Di şahiyê de Serokê Komeleya Farqînê Mehmet Çelîker axaftinek kir. Çelîker di axaftina xwe de balkişand armanca lidarxistina vê bernameyê û anî ziman ku armanca wan a esas ev e ku ji bo xizanan piştevanî û alîkariyê pêk binin. Çelîker di berdewamiya axaftina xwe de wiha got:

"Hedefa me ev e ku em girseya xwe ya xizan hembêz bikin. Her wiha em dixwazin xwedî li xwendekarên xwe yê xizan û serkeftî yên Farqînê derbikevin."

**'Em bi stranên wî coşiyan'**

Çelîk bi lêv kir vê şevê bi wesîlaya alîkariya ji bo Salîh Dalgin lidarxistin e û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Em dizanin ku hunermendê me yê navdar Salîh Dalgin nexweş e. Em bi stranên wî çoşiyan. Em bi stranên wî giriyan. Ji ber wê jî kesên stranên neteweyî çêdikin, ji kesên ku zagonan çêdikin bi hêztirin."

**'Divê em xwedî lê derbikevin'**

Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr jî tevli bernameyê bibû. Baydemîr jî der barê mijarê de nêrînên xwe anîn ziman û balkişand ser rola hunermendan ku di civakê de dilîzin. Baydemîr axaftina xwe wiha domand: "Divê em li hunermendên xwe xwedî derbikevin. Em şifayê ji bo hunermendê xwe Salîh dixwazin." Piştî axaftinan hemû kesên ku tevli bernameyê bibûn rabûn govendê. (**AMED - DÎHA**)



## Gel bi stra nŒn Bagca

Li navçeya Nisêbîna Mêrdînê konsera hunermend Cevdet Bagca pêk hat. Bagca bi hezkiriyên xwe re hate cem hev û şeveke baş bi hezkiriyên xwe da jiyîn. Cevdet Bagca li Navenda Çanda Mîtanî yê bi hezkiriyên xwe re hate cem hev. Şaredara Nisêbînê Ayşe Gokkan, serokê BDP'ê Durucayê, Şaredarê Akarsuyê Lokman Findik, Şaredarê Girmeliyê Omer Altun, Serokê BDP'a Nisêbînê û bi giştî 4 hezar kes tevli konserê bûn. Dem bi dem durişmeyên 'Şehîd namirin', 'Bijî serok Apo' hatin bezkirin. Gel bi stranên Bagca coşiyan. **MÊRDÎN**

## 'Lehengên Sereke yên Sînemaya Ewropayê'

### *Diyariyê Yilmaz Guney kirin*

Mîhrîcana Fîlman a Ewropayê ku li bajarê Lecce ya Îtalyayê pêk tê beşa bi navê 'Lehengên Sereke yên Sînemaya Ewropayê' diyariyê derhêner Yilmaz Guney kirin.

11'emîn Mîhrîcana Fîlman a Ewropayê dê di navbera 13-18'ê nîsanê de pêk were. Ji bo nasandina mîhrîcanê li Romayê daxuyaniyeke çapemeniyê hate lidarxistin. Di civîna çapemeniyê de hate destnîşan kirin ku beşa 'Lehengên Sereke yên Sînemaya Ewropayê' diyariyê Yilmaz Guney dikin.

Di daxuyaniya çapemeniyê de derbarê berhemên Yilmaz Guney de hate axaftin û wiha hate gotin: "Guney di sala 1979'an de li Locarnoyê xelata Leopara Zêrîn û di sala 1982'an de jî di Mîhrîcana Fîlman a Canesê de xelata Palmiyeya Zêrîn girt. Ji bo ku em nirxên berhemên wî bipêşkêş bixin dê di 15 nîsanê de civîneke were lidarxistin." Her wiha di civînê de hate gotin ku dê hevsera Yilmaz Guney, Fatoş Guney jî tevli civînê bibe.

Di civîna çapemeniyê de organîzetorê mîhrîcanê Alberto La Monîca axaftinek kir û diyar kir ku Ferzan Ozpetek jî fîlmê xwe yê dawî 'Serserî Mayinlar' hemû li Lecceyê kişandiye û got ku ew ji ber vê gelek kêfxweş bûne.

Di çarçoveya mîhrîcanê de dê fîlmên wekî; Issiz Adam (Çagan Irmak), Solîno (Fatîh Akin), Hayat Var (Reha Erdem),Sonbahar (Ozcan Alper), Havar (Mehmet Guleryuz) û Bahoz (Kazim Oz) dê bên nîşandan. **ROMA**

BERFO BARÎ

# Lêgerîna nivîskar Mîr Qasimlo

"Min pirtûkek xwend û jiyana min hat guhertin"

Jiyana niviskar Mîr Qasimlo ji di 2004'an ve bi xwendina pirtûkek bi kurdî tê guhertin! Di encama vê guherandinê de ew bi gencîneya zimanê kurdî ya ku di dil û mijêyê wî de ye dihise.Kelakela hevok û peyvan dibe sedem ku di sala 2006'an de ji nav Weşanên Pêriyê Romana wî ya ji 400 rûpelî pêk tê ya bi navê WÊNEYÊN KESERÊ " derkeve. 3 sal bi şûn re jî di 2009'an de romana duyem ya bi navê GIYANÊN BAHOZÎ ku ew jî 440 rûpel in derdikeve.

**Wêneyên Keserê**

Mîr, di vê romana xwe ya yekem de pirsgirêkên civaka kurd û bi û taybetî jî pirsgirêkên kurdên li Ewropayê bi riya du lehengan radixîne berçavan. Di destpêka romanê de lêgerîna nivîskar ya ji bo zimanek û tarzek taybet xwe dide der. Sazkirina hevok û bikaranîna peyvên xweser bala mirov dikişîne. Taybetiyek dinê jî ya nivîskar bi wêrekî serê xwe li hemberî kapîtalîzmê û paşverûtîyên civaka kurd radike. Lehengên Mîr yên ku bi vegotina serpêhatiyên xwe rewşa civakê ji Kurdistanê heya Ewropayê ji me re vedibêjin, mijarên weka welatparêzî, evînî, xiyanet, koçî , rêxistinî, têkoşîna kurd, hesreta welat vedikolin û herwiha guherînên ku pergala ewropa li takekesiya kurd kiriye ji me re rave dikin. Lehenga Mîr, Narîn keçikek kurd e ku ketiye tora jinfiroşên ewropayî û piştî ji destên wan direve rastî Mîrze tê, û roman ji wê derê pê ve bi devê Narînê dixemile, piştî ku lehengê sêyem Cemşîd jî beşdarî wan herduyan dibe, êdî mirov dengeya romanê winda dike û bala mirov dabeş dibe. Roman bi zewicandina wan herdû lehengan ber bi dawiyê ve diçe. Birêvebirê romanê Mîrze, tenê weka terapîsteke ku rê li vegotina Narînê û Cemşîd vedike xwuya dibe. Lê wisa xwuya ku hişê lehengên Mîr tevlihev in, dî serî de hişê Mîrze û dû re jî yê Narîn. Mîrze ji sedî sed bi diyalogên hişk yên pornografîk atmosfera romanê serobino kiriye, di cihên ku qet dîyalogên bi vî rengê ne pêwistin jî bikaraniye.

Narîn jî wek wî gava ku bûyerên qirêj yên bi serê wê de hatine vedibêje zimanekî tahrîkkar(kişkirîn) û teşîrî(pêşandî) bikartîne ji ber tevlihevbûna hişê wê hişê xwendevana jî tevlihev dibe. Ji romanê mînak;"Devê hezar mêran li serê memikên min geriyan, hezar mêr di ser cestên min de derbasbûn." Zêdetir diyalogên ewa yên ku ji bo diyarkirina rewşeke xemgîn ne pêwistin hatine bikaranîn. Ketina Cemşîd a romanê bandor qels kiriye, çiqas ji herdû mijar girêdayê hev bin jî li gor min , wêneyê Narînê bes bû. Wêneyên keserê hişyariyeke ji bo dê û bavên kurdên li Ewropayê.

Yek beşa romanê ew beş e ku serê Mîrze bi endamên rêxistina kurd re dikeve belayê, di vir de Mîrze nexweşiya me ya şîzofrenî (şik-guman) rexne dike. Zêde derketina ji mijaran û zêde vegotinên wekî pêşniyar peyamdayîna ji bo xwandevanan romanê qels kiriye. Tevliheviya serpêhetiya herdu lehengan pêşiya kûrbûna li ser romanê girtiye.

**Giyayên Bahozî**

Di Giyanên Bahozî de lêgerîna encamek stendiye û mirov kare bibêje ku êdî şêwaza nivîsandina Mîr rûdinê. Ji îro pê de dê mirov karibe bibêje ev ziman ango ev hevok yên Mîr Qasimlo ne. Xweseriya Mîr ya bi lîstika hevokan êdî taybetiyek wî ye. Giyanên Bahozî sentezek e, ku alternatîfek jiyanê pêşkêşî jin û mêrên kurd dike. Êdî nivîskarên kurd hewl didin ku dengê dilên takekesiyên kurd ji bin kolektivîzma ku dirûv û çanda xwe ji fedoalîzmê girtiye derxînin .Weke nivîskar Cîhan Roj, Mîr Qasimlo jî xwendevanan, vedixwîne guhdarkirina dengê dilê xwe.

Giyanên Bahozî hindik maye bibe destanek, li ji ber dêrûniya qarekterên modern ji ber deriyê destanê vegeriya ye. Diyalogên ku bi têgehên modern xemilandîne û dûrî rastiya karekterên ku di rewşe evînek gewreda ne de, rê nade ku ev berhem bibe destenek. Ji romanê çend diyalog;

**1.** Zerî Dotmam "Dizanim dîno tu min bi şalê spî, bi derpê û bersîngên hevreşimiyên rengemorî bi porê vekirî û bi lêv û hinarkên dermankirî dixwazî.

**2.** Artîn bangî mirinê dike: "Ka were min ramûs... û ez ewqas ji te hez dikim ku ligel hemû wesleyên cesetê xwe dikarim qûna xwe jî ji bo qamişê te hesayî bikim. De were mertal terikiyo!!!Bi rastî jî qûna min, ji bo karê tu divê tu pê rabibi amadeye."

Tevî ku Artîn, evînek weka Mem dijî jî û ew evîn, wî weke Mem ber bi mirinê ve jî dibe lê di diyalogên jor de xweya dike ku lehengên romana Gihayên Bahozî jî xwedî dêrûniyek tevlihev in.

Artîn paqijiya evîna xwe ji Zerî dotmamê bi van gotina dibêje;" Divê tu zanibe ku ew û ev hemû hewlên min, ne tenê ji bo ramûsaneke ji lêvên te û zewq girtina ji pîroziyên te bû."

Lê di beşek din de jî lehengê sereke yê romanê evîndarê bêhempa Artîn gotinên li dijî wan diyalogên jor dibêje; Erê ez li te mêze dikim. Lewra mêzekirina li qorinç, pişt, çîp, qûn û li babûna porên te yê gulgulî min har û dîn dike.

Van axaftinên jor wekî ku ne ji devê kesên ku evînek pîroz dijî derketine, ji ber ku hestîyarî û evînî pêwistî bi dîtina qorinç, pişt, çîp, qûn, bersîngên sor, derpîkê mor nîne.

Sedemek dinê jî ew e ku lehengên Mîr tevî birîna xwe ya evînê mecbûr mane ku rê û dirb nîşanê civakê bidin.

Ev hewldan hetanî cîhekî weke felsefe di romanê de jî xuya dike. Lê bi taybetî lehengên romanê çiqas nêrînên serdestiya mêran rexne bikin jî bi bikaranîna têgeh û sembolên vê nêrînê ketine dehfikê.

Wekî gotinên dawî, ji alî ziman û hûnandinê ve Mîr Qasimlo serkeftiye. Romana duyem ya Mîr Qasimlo gelek bi tehm û herîkbar e. Zimanekî wêrek e. Li ser felsefa evîn û jiyanek hevpar di nava jin û mêran de wê asoyê xwendevana fire bike, ne mimkun e ku xwendevan di bin bandora wê de nemînin. Êdî piştî xwendina Gîyanên Bahozî wê mêr werin rê û wê bi van peyva bangî evîndarên xwe bikin.

"Gulgulî esmeran... Berfîna li dilan… Stêrka li çavan…Kena li ser hinarkan…Rehwana li qadan…Pêşreva Firîştekan…Serhildêra bêpîvan…"

"Ka were çav keskê…Awir yezdanê…De were lê…De were cehniya min a bedew…were çip goştê…Lêv ziravê min a hov…giyana min a kovî…Ka were min carek din bikuje."

www.arsivakurd.org

# Xwediyê sekna bi rûmet

CENG HÊVÎDAR

**Êdî hemû hêvî qediyan û vî kesî di sekna xwe de israra xwe domand û dev ji ola xwe berneda û neçû ser baweriyeke din. Cezayê vê yekê jî li gorî pîvanên vî welatî bidarvekirin bû**



Li gora çîrokê du welatên cîranên hev ku ola yekî îslam û ola dewleta din jî oleke cuda ye, hene. Li welatê ku ola wê îslam e bêkarî, xîzanî, tevliheviyên siyasî û hwd. hene. Lê berovajî vê yekê, li welatê cîran ku ola wan cuda ye, ne pirsgirêka aboriyê, ne pirsgirêka kar û ne jî pirsgirêkên din hene...

Ji ber bêkarî û xizaniyê gelek kes ji welatê ku ola wê îslam e direvin û diçin bi qaçaxî li welatê cîran ku ola wan cuda ye dixebitin ji bo ku debara xwe bikin. Lê tu kes bifermî nikare biçe û himin divê bi dizî biçe da ku neyê girtin û bi tu cezayên giran re rû bi rû nemîne. Dîsa rojekî sê hevalên hev biryarê didin ku ew jî bi qaçaxî derbasî welatê cîran bibin û ji xwe re li wir bixebitin. Ev her sê heval gotina xwe dikin yek û biryara xwe dikin, teqez ku ew ê sibê li sînor bidin û derbasî welatê cîran bibin. Şev derbas dibe, dibe sibeh û demê çûyîna wan tê.

Her sê heval xwe li dereke nêzîkî sînor vedişêrin û nobedarên li ser xeta sînor diçin û tên, raçav dikin. Piştî demekî ji xwe re rêyekî destnîşan dikin û li sînor didin da ku derbasî aliyê din bibin. Piştî meşa çend xulekan ew têne ferqkirin ji aliyê nobedaran ve, li ser vê yekê her sê heval ji bo rizgarbûnê her yekî bi aliyekî ve direve û hewl dide ku dewsa xwe bide windakirin.

Lê di demek kin de her sê jî bi awayekî hêsan dikevin dest û ew têne girtin ji aliyê nobedarên li ser xeta sînorê welatê ku ola wê ne îslam e. Van her sê hevalan dibin qereqolê û wan didin lêpirsînê. Ew jî rewşê ji rayedarên qereqolê re dibêjin û her wiha daxwaz dikin da ku ew bêne berdan.

Lê rayedarên qereqolê şertekî datînin pêşiya wan û dibêjin "heke hûn dev ji ola xwe berdin û werin ser baweriya me, em ê hem we azad bikin û hem jî kar bidin we û hetanî ku we bivê hûnê bikaribin li vir bixebitin."

Li ser vê yekê du heval hema di cih de dibêjin "temam" û radestî ola wan dibin. Lê hevalê siyan vê yekê qet napejirîne û dibêje "ez qet nayêö ser baweriya we û vê pêşniyara we jî red dikim." Rayedarên qereqolê bi rojan li ber vî kesî didin ku ew dev ji helwesta xwe berde û were radestî ola wan bibe, lê dikin û nakin ev kes ji ya xwe nayê xwarê û berxwedana xwe didomîne. Li ser vê yekê rayedar radibin ew her dû kesên ku radestî baweriya wan bûne dixin dewrê ji bo ku wî kesê sêyemîn îkna bikin û bixapînin. Lê ev rêbaz jî encamê nade û ev kesê sêyemîn sekna xwe xera nake û li ber xwe dide. Di ser bûyerê bi qasî çend mehan derbas dibe, ev kes bi cezayên gelekî giran re rû bi rû dimîne lê dîsa jî helwesta xwe ya bi rûmet didomîne û dibêje "hûn min kevel jî bikin ez dev ji ola xwe bernadim û nayêm radestî ola we nabim ji ber ku ev yeke ne li gorî felsefeya min a jiyanê ye." Îcar rayedarên qereqolê vê bûyerê ji payebilindan re radigihînin û dixwazin payebilind di derbarê vê bûyerê de biryarê bidin. Li ser vê daxwazê komîsyoneke ku ji çend payebilindan pêk tê dişînin qereqola navborî û dixwazin ew bûyerê bigihînin encamê lê bi teqez encameke erênî.

Di vê navberê de her dû hevalên ku radest bûbûn bê navber ji bo ku hevalê xwe qayîl bikin di nava liv û tevgerê de bûn. Lê her carê ew têk diçûn û hevalê wan ji vê sekna xwe tu tawîz nedida...

Piştî çend rojan heyeta ku ji bo îknakirina wî ku ew ji payebilindan pêk dihat, hatin qereqolê û dest bi karê xwe kirin. Her yek ji wan bi rojan bi wî re ketin nîqaşan û gelek sozên ku jiyana wî vegerînin bihiştê dan, lê dîsa jî nekarîn ramana wî biguhêrin û wî bînin ser baweriya xwe.

Her payebilindekî bi rêbazekî xwest vî kesî têk bibe lê di encamê de yên ku di sekna xwe de têk diçûn her ew bi xwe bûn. Ev bûyer jî, roj bi roj îcar di çapemeniyê de derket û belav bû. Hema hema ji her dû welatan kesek nema ku bi vê bûyerê nehesiyabe.

Ew çend caran bidarvekirinê hat tehdîtkirin, gelek caran îşkenceya giran lê kirin, ew bi rojan tî û birçî hiştin dîsa jî nebû; wî ji sekna xwe paş de gav neavêt. Gelek kesên qedirbilind ketin navberê da ku ew were berdan lê di her carê de ev helwdan jî bê encam man.

Êdî herkes di nava meraqeke mezin de bû; dê ev bûyer çawan bi encam bibe. Êdî ev kes û her dû hevalên wî ji wê qereqolê derxistin û ew anîn paytexta welatê ku ola wê ne îslam bû. Li paytextê jî ji bo îknakirina wî hin kesên taybet rêkirin cem wî da ku serê wî tevlihev bikin û wî îkna bikin.

Lê dîsa encam wekî her carê bû; wî sekna xwe xera nekir û dev ji ola xwe berneda. Êdî her ku diçû vê bûyerê hem li her dû welatên cîran û hem jî di raya giştiya Cîhanê de bêhtir deng vedida û mezin dibû. Di dawiyê de serokê welêt dibêje "ez ê bi wî re biaxivim ji bo îknakirinê." Rojekî serokê welêt diçe girtîgeha ku ew kes lê tê girtin û bi wî re rûdine û diaxive. Serok jî ji wî re wiha dibêje "law ehmeq, ma tu çima evqasî dirêj dikî? tu yê bi gotinê bêjî "ez ê bêm ser baweriya we, piştî tu azad bûyî jî ji xwe tu yê dîsa li ser baweriya xwe bî." Ev kesdîsa wekî xwe dike û dibêje "ez vê yekê jî nakim, hûn dixwazin çi bi min bikin jî ez ê ji vê sekna xwe paş de gav neavêjim." Êdî serokê welêt baş têdigihîje ku ev kes ji ya xwe nayê xwarê, zêde dirêj nake û radibe diçe.

Êdî hemû hêvî qediyan û vî kesî di sekna xwe de israra xwe domand û dev ji ola xwe berneda û neçû ser baweriyeke din. Cezayê vê yekê jî li gorî pîvanên vî welatî bidarvekirin bû. Her dû hevalên wî sibê hetanî êvaran li ber wî didan û digotin "dê em jî di gûyê te de bixeniqin." lê wî dîsa jî tu guhdan bi wan nedikir.

Êdî hemû rê hatibûn ceribandin û ji yek riyê jî encamek baş nehatibû bidestxistin. Welatiyên ku li vî welatî diman dixwestin rojeke zûtir ev kes ji ber ku neçûye ser baweriya wan, were bidarvekirin û di demek kurt de dê ev kes bihata bidarvekirin.

Li meydaneke mezin a di nava paytexta welêt de sêdar hate vegirtin û dê ew li wê derê bidarve bikirana. Roja wê hat û ew her sê heval birin wê derê. Lê çima du sêdar hatibûn vegirtin tu kesî tu wate nedida vê yekê. Meydan hêdî hêdî tije bû tevahiya welatiyan mereqa vî kesî dikirin û dixwestin wî ji nêzîk ve bibînin.

Her sê heval derxistin ser cihê sêdarê û bêdengiyê perdeya xwe kişand ser lehiya ku ji mirovan pêk dihat. Lê ji nişkê ve bûyerek ewçend ecêb qewimî ku devê hemû kesî vekirî ma; ne kesê ku li berxwedayî lê her dû kesên ku radestî baweriya wan bûbûn hatin bidarvekirin. Li ser vê yekê jî serokê welêt neçar ma ku vê sosretiyê rave bike û mantiqa vê yekê vebêje.

Serokê welêt derket hemberî girseya ku di wê meydana mezin de bicih nedibû de û wiha got: "ew kesê ku bi kêrî ola xwe neyê ew dê bi kêrî tu oleke din jî neyê. Ev kesê ku di bin evqas pêkutiyan de jî dev ji ola xwe bernedayî ew bi vê sekna xwe bûye semboleke gelekî binirx." li ser van gotinên serokê welêt girse belav dibe.

## XÊZIKNAME

Zarok di zindanada bin dê kulîlk jî xwe bikujin




Gotinên Reco yên ele tewşo





Hewildanên li ser zarokên kurd



# Xeta ceryanî penceşêr vila keno

Zaf cayanê Tirkîya de şar binê talûkeya xeta ceryana berz de yê, ema rayberdoxî weşeya şarî nêgenê çiman vero. Welatijanê ke binê ceryanî de yê nêweşîyanê ze penceşêrî ra rû bi rû mendê, wazenê wa têlî wedaryê



Wêne: Salih SERTKAL

Taxa Wanî ra Bostanîçî qabê ke sewkîyata ceryana TEÎAŞ vila bikê dîreganê xeta ceryana berz bîyo hewna talûkeyê. Gora niştecayanê ûca vanê hetanê ney demî nêzdî 10 kesan ceryana berz ra heşê xo vînî kerdêy. Gora zanyaran kesê ke 50 metre nezdî ney dîregan bibê se di bin nêweşîyana tumor, losemî û cûreyanê penceşêrî binde yê.

Xeta ceryana berz ya Bostanîçîya Wanî talûkeya herî gird vila keno şarî sero. Xeta ceryanî veng vejeno û radyasyon vila keno ra şar nerehet o. Qabê ke xetanê ceryanî bivejê teberê cayê roniştişî ra waştişname day dozgereya komara Wanî.

**Wa dîregan wedarnê**

Welatijê ey cayî ra Ahmet Firat ard ziwan ke, cayê ke xeta ceryanî şino zaf verî dewlet bi pereyê zaf tayn gitoro û vat: "Se beno wa bibo, gere nêy dîregî kêyan mîyan ra bêro wedarnayiş. Çimkî merdimî etya de estêy. Bi rayan ma sere dayo ke bêrê wedarnê ema hetanê ney demî çîyê zî nêbîyo." Û ard ziwan ke wa rayberdoxî ney mijarî de bi hêstîyar bê.

**Welatijî nerehet êy**

Mahleya Guneydoxî ra Cemîl Başaran zî ard ziwan ke xeta ceryanî bi temamî sere bonê mi ra şino û vat: "Semedê ceryanî ra gedeyê mi heşê xo vinî kerdo. doxtor vato semedê ey sîniranê ey xirabe bîyo." Ze kêyê Başaranî nezdî 10 kesan vat kêyê ma de gede ya zî kesê wina nêweş estêy. Û vat: "No xet 10 km kêyan, arseyan û dormeyan de şino. Her roj veng têlan ra yeno. Par têlê visya û kêye de şewat vejya. Warê kêyî tîya terk kerd û şi Mêrsînî."

Mudurê kotrola TEÎSAŞ'î Mehmet Acar ard ziwan ke, zaf cayê ke xet sero şino dewletî giroto. Tikey cayan de zî hewna karê girotişî dewam keno û vat: "Qabê ke telî bivejê teberê kêyan hetanê ney gamî çîyê zî nîyameyo kerdiş. Tirkîya de heme cayan de no kar wina yo." (WAN / DÎHA)

# Legleg çira yenê herêma Mezopotamya?

EHMEDÊ BIRA

Amayişê leglegan (leylek) ya cayê îşareta amayişê wesarî yo. Leglegîy dinyayî zî warê bapîr û dapîranê xo vinî nêkerdêy. Her ser yenê Mezopotamya bi teybet zî deşta herêmanê Amedî de xo cayanê berzan de bi ca kenêy.

Leglegî heywananê koçber êy. Deyaxê serdî nêkenêy. Ney semedî ra, her ser cayê xo bedilnenêy û serrê de nêzdî 5 hezar km rayîr perenêy ke, cayanê germin û bi werdiş tede esto geyrenê.

**Leglegî rota xo zanêy**

Leglegî bapîran ra yo ke rota xo qet vînî nêkerdê û her ser, zêd benîy û ze merdiman êy zî dinyayî de vila bîyê. Rota rayîra xo gora hîsîyeta xo kenêy û cayanê ke rawestê her tim ze dûraxa otobozan belî yo. Boya xo girotî pey ra, dewamê rayîra xo kenêy. Heywananê azad ra yê. Ema cayê înan ye ke sabît semedê serdî ra çîno. her ser yenê hêlîna par sero hakanê xo kenêy. Temenê leglegî goreya ke yeno vatiş 20-22 serr o û her ser yeno hêlîna xo sero vindenêy û jîyanê xo domnenêy. Rayîra derg û zorî de her ser merdişê înan beno ema hetanê ney demî qira înan nîyameyo.

**Leglegî çira Mezopotamya de zaf êy?**

Gora cigeyroxan herêma Mezopotamya ra, herê Amedî de, bi teybet leglegî zaf êy. Semedê ney merdim şikyeno wina rêz bikero.

✓ Semedê ke legleg zî, ze merdiman etyara vila bîyê dinyayî û kokê xo vînî nêkerdê û rayîra etya esasê mezgê înan de esto. Ze heme olanê dinyayî Mezopotamya de estê û çimanê merdiman tim û tim ney axande yo se, êy leglegan zî wina yo.



✓ Semedê ke ney cayî de; eynîy, bestîy, rûbarîy, çemîy gelîy û zewbî tewr cayî zaf estêy û ney cayan de zî werdişî zaf êy ra.

✓ Demsala germahey gora herêmanê bînî daha weş û zaf nêbedilyeno tim û tim mîyanê şew û rojî de 11-15 derece ferk esto û semedê ke nem tayn o ra bedilyayiş zaf nêbeno û no zî qabê leglegan nîmetê yo.

✓ Dewan de cayanê berzî zaf êy ra.

✓ Deştanê Amedî de semedê ke dîreganê ceryanî yê berz estîy û no zî qabê leglegan ewlehey daha weş keno û amnanan germaheya erdî ra înan paweno.

Merdim çîyanê wina hewna zî şikyeno teybetîyanê Mezopotamyayî zêd bikero. Ema esasê ey bi ney xêzan xêz beno ra leglegî zaf êy.

**Serra ke legleg erey bêrêy…**

Merdiman verî mîyan de, serra ke legleg wesarî erey bîyamaynê se, a ser nîşana serd zêd beno û rew yeno. Merdiman zî gora înan hadreyeya zimistanî kerdêy. Çimkî ey seri de îhtîmalê de gird zimistan rew û bi şîd şiyê. Çimkî leglegî zanistêy aw û vayî yê. Êy gora, bi hîsanê xo xozayî de geyrenê û ceribnayişê bapîranê xo weş zanêy.

**Legleg aramey û bereket o**

Bawereya Mezopotamya mîyan de, sera ke leglegî zaf bê se, a serr bereketa axî zaf o. Çimkî werdişê legleg zaf bo se, nêmirenê û zêd benê û zêd eysenêy. Eg tayn bo se, a serr çîyê werdişî tayn o û semedê ke leglegî xo mird bikerê ra, şinê cayanê bînan de geyrenê ke gestana nêmirê. Ey pey ra zî tayn eysenê û şarî mîyan de zî no tersê dê gird virazeno û beno ke ey serrî zêwî kemî bê û ya zî nêbêy.

## Welatê ma



*Welatê ma de;*
*Sifte dew û birî vêşnay*
*Dima dewijî cayê xora kerdî teber*
*Doradime ambargo şana ci, rayîr birnay*
*Îyê ke pey de mendî, veyşan verday*
*Peynîye de ûca ra eve xo fetêlay;*
*Sondane lû û vergî, sodirane cendirmey*
*Welatê ma welatê jiarî*
*Kutikê teverî bîyê harî*
*Çar hetê Weletî birnê*
*Nêverdanê şime dew û warî*
*Khalo sipê, Munzur Bava*
*Riyê toyo sıpêla*
*Kuto ra ma vîrî*
*Sûltan Xidir, Duzgin Bava*
*Welatê ma, welato de xas o*
*Ko ey berz ê, dormê xo kaş o*
*Rozê cêreme ra Welatê xo*
*Kesîrê nêverdame na hêyfî...*
*Khalo sipê, Munzur Bava*
*Rîyê to yo sipêla*
*Kuto ra ma vîrî*
*Sûltan Xıdır, Duzgin Bava*

***dersimnews.com***
***HAWAR TORNÊCENGÎ***

# Nêzanayişê asnawe

HEBÛN OKÇU

Mi sinifê şeşine qedênabi û qarnê xo zî pa teqdîrî girotebî. Mi yew tatîlê hamnanî weş heq kerdibi.

Hamnanî germê Amedî ver merdim nêeşkeno dayax bikero.

Germî ver şar Amedî terk keno. Yan şinê verê çeman yan zî şinê cayanê tatîlî. Cayê tatîlê ma zî dewê ma ya. Ma şinê dewê kalê min.

Namê dewê kalê min Barav a.

Barave, yew dew a ke dar û ber ra kewe ya, mîyanê koyan de ya.

Hîrê mehlê xo estê. Namê mehlanê ci: "Dîyarê Sawe" yan zî "Berxîg", "Sizêrin" û "Sunzêre". Barave de darê fêkîyan zaf ê. Darê fêkîyan ê yabanî zî zaf estê. Zewnbî tede tewr bi tewr zebze esto, baxçeyî tede zaf ê.

Bi eno şeklê xo Barave zê cenetî ya. Awê çemê Barave anî weş herekîyena ke însan bianyo awe ra tede heyran maneno. Mîyanê çemî de kerrey zê zerdî bereqyenê. Rocêke min û babê xo pîya verê çemî de ma xo rê ê kerran ra arêday. Mîyanê ê kerran de yew estibî, eynî zê îskeletê sereyî bî. Eka ez nêzana babê min a kerra pê se kerde.

Mîyanê çemê Barave de tayê cayan de golê xorîy estê. Kiştê enê golan de kerreyê xişnî estê. Binê enê kerran de zî masey estê. Gama ke masey binê kerran ra vecîyenê, binê tîce de paştê îne zê sîmî bereqênê. Goştê enê masan zî zaf weş o.

Gama ke ma şî dewe, rojêk ez û hevalê xo ma şî verê çemî. Ma nan, sole û torre zî xo dir berdî. Min û hevalanê xo ma qasê xo ra masey qefelney. Ma adir kerd we. Ma eştî serê adirî. Mîyanê vengê wîç-wîça mîrçikan de ma lingê xo kerdbî mîyanê awe û ma xo rê masey kebab kerdêne, werdêne.

Wext hame nîmeyê rocî. Dewê ma de eno wext zaf germ bîne. Ma zî kewtêne mîyanê golanê çemî. Cayo ke mi xorînîy ci nêzanêne ez nêkewtêne mîyanê gole. Mi asnawe nêzanêne ya! Hevalê min ê dewe, pêro kewtêne mîyanê çeman. Gama ke kewtêne mîyanê awê çemî, mîyanê xo de xo rê henekî kerdêne û awe pernêne yewbînî. Gama ke awe hewa ra bî, tîce dayne awe ro û keskesûre tede virazîyayne.

Ez zana ke awe de senî keskesûre virazîyena. Mi mekteb de, dersê Fen Bîlgîsî de wendibi, ez ûca ra mûsawa. Gama ke tîce hewa ra ginena awe ro, roşnê tîce mîyanê awe de şikîyeno. Eno şikîyayişê tîce de heme rengî têmîyan de eysenê û verê çimanê ma de keskesûre virazîyena.

Hevalê min kewtibî gole la ez xorînî ra tersayne. Hevalê min dewe ra bî, îne weş asnawe zanayne. Şîne serê zinaranê xişnan û zê masan xo eştêne mîyanê awe. Rey-rey bi henekî îne ez zî kaş kerdêne mîyan gole, cayo xorîn. Mi xo mîyanê destanê îne ra feletneyne.

Kiştê golêk de yew kerraya xişne estibî. Serê ena kerra kevzin bi.

Areyêke ez şîya serê a kerra û xo rê ronişta, mi temaşeyê awe kerd.

Seyîn bi, ez eka zî baş nêzana. Seyîn bi se, ez serê kerraya kevzine ra şeqetîyaya û nişka va mi xo mîyanê xorînîya gole de dî. Mi va ya, ez asnawe nêzana. O wext hevalê mi zî gole ra vecîyabî û serê qûmê verê çemî de xo rê kay kerdêne. Hetanî eka ez çi rey bi eno qeyde nêkewtibîya panîk. Mi qewetê xo heme arê kerdibi û mi destê xo berdêne-ardêne. VATE Sereyê min seyîn mîyanê awe ra vecîyayne ez qîrrayne. La reyna sereyê min şîne binê awe. Fekê min akerde bi, awe şîne mîdeyê min.

Reyke sereyê min mîyanê awe ra vecîya û ez qîrraya. Ez fetesîyêne.

Sereyê min mîyanê awe ra seyîn bivecîyayne, ez qîrrayne. Fetesîyayîş seyîn o, ez eka daha weş zana.

Hayî hevalanê min dinya ra çinî bî. Ez çiqas qîrrayne zî veng nêşîne kesî. Enerjîyê min qedîyêne. Ez reya peyine qîrraya. Çimê min bî tarî.

Ez vana qey vengê min şibi hevalan...

Serê qûmê verê çemî de, qîrrayîşê hevalan hame goşê min. Wexto ke mi çimê xo kerdî a, ez newe ra hamebîya dinya.

Ez vana qey emser tatîlê hamnanî de ez reya dîyine hamîya dinya. (VATE)

ROJEV
4 Nisan 2010 Hejmar: 6 Sal: 1

## Serêkaniya dîrokê...

Li ser Gobeklîtepeyê û rastiyên dîrokî yên ji vir derdikevin ser rûyê erdê hê jî kêm tişt hatine gotin. Arkeologên weki Prof. Dr. Halet Çambel û Prof. Dr. Robert Braidwood pêşengiya kolanên li Gobeklîtepeyê kirine, di heman demê de tevrê xwe li dîroka qedîm a Mezopotamyayê dane. Gobeklîtepe yek ji navendên serdema Neolîtîk tê qebûlkirin. Cara yekemîn di sala 1963'yan de kolanên arkeolojîk dane despêkirin û îro arkeologê alman Klaus Schmidt kolanên li vir didomîne..





# Warê pêşengên qenaetê: Riha

Serdestan ji bo nasnameya vî warî ku kevneşopiya pêxemberan temsîl dike ji holê rabikin gelek bizav kiriye. Lê di her carê de têkçûne. Kevneşopiya ku ji Brahîm Xelîl hatiye destpêkirin di serdema hemdem de li Îmraliyê tê demandin. Di gelek biharên vî warî de zayînên pîroz ên mirovahiyê pêk hatine

ADIL ZOZANÎ

Ji bo Rihayê çi bê gotin, baş e? Bersiveke klasîk a vê pirsê heye: Riha bajarekî pîroz e. Bajarê pêxemberan e.

Kêm zêde her kesekî ku nesîbê xwe ji dîrokê girtiye dikare bersiva vê pirsê bi vî şêweyî bide. Bersiveke rast e. Lê kêm e. Bi tenê pîrozwerî raweke piştrast nîn e ji bo Rihayê. Lewre Riha, di heman demê de bajarê berxwedêriyeke pasîf e jî. Wargehê ramyariyeke ku ji bo gelek qewman re bûye bingehê hişmendiyeke civakî.

Li gorî dîrokzanan beriya bûyîna Îsa heta 8 hezar salan dîroka Rihayê diçe. Di vî warî de rîwayetên muhtelîf hene. Lê ligel lêkolînên arkeolojîk ên Gobeklîtepeyê rastiya dîroka Rihayê her ku diçe pirtir ronî dike. Ji bo sazkirina vê wargehê qedîm du rîwayet derbas dibin. Yek ji wan ew e ku tê gotin Riha ji aliyê Îdrîs Pêxember ve hatiye avakirin. Li gorî rîwayetekê jî Riha piştî tofana mezin ji aliyê Nuh Pêxember ve hatiye avakirin.


Ligel ku di vî warî de rastiyeke ku her kes li ser bûye yekgotin tune ye, baş tê zanîn yek ji wargehên Mezopotamyayê ye ku bûye sembol…

**Bajarê nasnameya xwe parast**

Ji sûmeriyan bigire heta med û persan Riha di nava kelejana dîrokê de hebûye û bûye wargehê serhildêriya civakî. Tarzekê wê yê cihe heye. Naşibe çu derên din. Li vir li ser hêmaya mazlûmiyetê rabûnek heye. Ji ber hindê jî kevneşopiya wê ya ji serêkaniya pêxemberan avê vedixwe derdikeve pêş.

Ev bajarê di dîrokê de navê Ur jî lê hetiye kirin, ji bo hemû Mezopotamyayê yek ji wargehên serkêş e.

Serhildana Hz. Brahîm Xelîl a li hemberî Nemrûdan dibe ku wekî serêkaniya esasî ya terzê berxwedêriya vê wargehê bê qebûlkirin. Bêdeng e, lê dema dor bê jî gotina xwe jî dibêje. Sumer, akad, hitît, babîl, kalde-hurî, mîtanî, aram, asûr, med û pers lê bûne niştecih, lê yekê ji van qewman nekariye tarzê vê wargehî biguherînin. Kevneşopiya pêxemberan a ji vê wargehî re mayî di heman demê de ji bo bûye nasname. Ji ber hindê jî jê re tê gotin bajarê pêxemberan.



**Li vir hêmaya mîstîzmê cihe ye**

Madem bajarê pexêmberan e, wê demê nasnameya vê bajarê ya 'mîstîk' jî divê bê vehorandin. Mîstîzm li her dera cîhanê bi heman şêweyî tê ravekirin: Xwedûrxistina ji keft û lefta dinyadariyê. Erê gelo mîstîzma Rihayê jî wisa ye. Her çiqas wekî bandora dem û wextê bê şîrovekirin jî, Riha di warê mîstîzmê de jî naşibe wargehên ku mîstîzmê biawayekî klasîk dijîn. Di nava mîstîzma Rihayê de, di heman demê de teşedayîna jiyana civakî jî heye.

Çend ol û baweriyên cihe, li vê bajarê qedîm bi cih bûbin, her yekî bi awayekî xwe parastiye û bandor li ser jiyana civakî kiriye. Îro di nava jiyana rojane de gelek şopên ber bi çav ên vê rastiyê hene.

Ne Nemrûdan û ne jî Îskenderê Mekadonî nekariye vê rastiyê biguherînin. Civak, li Rihayê, ji tîranan pirtir, guhdarê pêşengên qenaeta gel guhdarî kiriye. Ji ber hindê jî tîranan tim xwestiye vê Rihayê bi dest bixin lê nekarîne ruhê bajêr ê serhildêr tune bikin.

**Serwer nebûn xwediyê bajar**

Gelek caran hatiye pirsîn, xwediyê vê bajarê kî ye? Serdestan bi walî û zabitên xwe îdia kiriye ku ev bajar ê wan e. Lê paşeroja Rihayê tiştekî din dibêje. Çu caran nebûye bajarê serdestan. Pêşengên qenaeta civakê temsîl dikin, ji waliyên serdestan pirtir hatine guhertin.

Ji demekê bi şûn de serdestan jî ev rastî fêmkiriye û rêbazên xwe guhertine. Xwestine bi destê pêşengên qenaeta civakê, civakê ber bi xwe ve bibin. Dema îro mirov lê dinêre, dibîne ku serdest di vê polîtîkayê de serkeftî bûne. Piştî pêşengên qenaeta civakêbûn, singê dîwarê serdestan kevneşopiya serhildêr a bajarê qedîm her ku diçe ber bi mirinê ve birine.

**Terzê serhildêriyê mazlûm e**

Ligel ku wisa ye Riha, dîsa jî wargehê serhildêriyeke xweser e. kevneşopiya ji pêxemberan hatiye dewrgirtin zû bi zû ji holê nayê rakirin. An jî em bêjin emrê çu serdestan têrê nekiriye ku vê xerabiya mezin bibe serî.

Herî zêde xwestine bi destê ola Îslamê bi ruhê serhildêr ê Rihayê bê lîstin. Herî zêde pêşengên qenaetê yên bi baweriya Îslamî radibin, xwestine bibin pelgezka (maşe) serweriyê. Nêzî hezar salan in bi vê şêweyê aşek li hemberî kevneşopiya Rihayê ya ku li dewsa tîranan, pêşengên xwe guhdarî dike tê hêrandin. Herî zêde jî di nava sed salên dawî de ji aliyê 'komara laîk(!)' ve hatiye xwestin ku ruhê serhildêr ê Rihayê teslîm bê girtin.

Ji ber hindê kesayetên li ser navê olê pêşengiya qenaeta civakê dikin, ji demekê bi şûnde ava coyên civakê bi ser aşê serweran de berdane. Li dewsa ku mîsyona xwe ya ji rêbertiya civakê bi cih bînin, bûne xizmetkarên serweran.

## Brahîm Xelîl û Pengava Masiyan



Hz. Brahîm Xelîl yek ji pêxemberên ku ji Rihayê rabûne ye. Bi sebra xwe ya mezin tê nasîn. Çîroka wî ya bûyînê, xîmê sebra wî vedibêje. Li gorî rîwayetê Nemrûd rojekê di xewna xwe de dibîne ku zarokek tê dinyayê qraliyeta wî ji dest diçe. Ji ber vê xewnê hemû zarokên wê salê hatine dinyayê dide kuştin. Dayika Hz. Brahîm Xelîl, Nuna di vê salê de pêgirana wî bû. Ji bo ku zarokê wê nekujin ducaniya xwe vedişêre û li şikeftekê Brahîm Xelîl tîne dinyayê. Brahîm Xelîl heta 7 saliya xwe di vê şikeftê de dimîne. Brahîm Xelîl piştî mezin dibe, li hemberî perestgehên Nemrud têdikoşe. Û Nemrûd wî digire û dixwaze ku bişewitîne. Lê daxwaza Nemrûd pêk nayê. Cihê Brahîm Xelîl lê dihate şewitandin dibe pengav û êzingên ji bo şewitandina wî anîne jî, bûne. Ji bo Pengava Masiyan a serboriyeke bi vî rengî hatiye vegotin heta îro jî,yek ji wargehên pîroz ên Rihayê tê qebûlkirin.

Ji bilî Brahîm Xelîl, Hz. Eyûp, Hz. Elyasa, Hz. Şuayîb, Hz. Nuh, Hz. Mûsa, Hz. Lûd û Hz. Yaqup hin pêxemberên din ên ku ji Rihayê rabûne ne.

**Xwestin pê bilîzin**

Ligel ku ev qas bi ruhê vê bajarê qedîm ê Mezopotamyayê hatiye lîstin dîsa jî ji hembeza xwe pêşengên ku serî li hemberî serweran netewandiye afirandiye.

Tarzê Hz. Brahîm Xelîl ji xweliya xwe vejiya. Riha ji bo vegere ser ruhê xwe yê serhildêr bihar kirin demsalên vejînên nû. Tovê jiyanê yê ku di mehên adar, nîsan û gulanê de li vê wargehê şitildayî qedera Rihayê ya hatiye serbijêrkirin berovajî kir û mîsyona pêşengiya civakî dîsa li vî bajarî barkir.

Îro dengek li ber guhê Rihayê olan dide. Jê re dibêje, 'ji bîr neke, tu bajarê Hz. Brahîm Xelîl î…'

**Ji Brahîm Xelîl heta Ocalan**

Sebra Eyûbê kurmexwarî diyarî civakên serhildêr kiriye, îro li Îmraliyê ji aliyê zarokekî din ên vê bajarê qedîm ve tê temsîlkirin. Îro rojbûna wî ye. Piştî hezaran salên din navê Hz. Brahîm Xelîl û rêzdar Abdullah Ocalan bi hev re di rûpelê pêşîn ê dîroka Mezopotamyayê de bêne xwestin, xerîb nabe. Lewre ew diyariyên vê bajarê qedîm… Rihayê ne.



www.arsivakurd.org